# BERNAMEYÊN RADYOYÊ YA DEM Û

# CAZÊ



Kültür_
için__
Alan___

amed

SWING
AMED

# NAVEROK


## 1 LI ROJHILATÊ CAZ S.3

STRANA 1'EM [ 2:58 DK ]
Tara Mamedova – Çuko Rebeno

STRANA 2'YEM [ 6:57 DK ]
Dhaffer Youseff - Of Beuty and Odd

STRANA 3'YEM: [ 7:22 DK ]
Wonderland - Karşı Yaka

STRANA 4'EM: [ 6:31 DK ]
Mohsen Namjoo - Toranj

STRANA 5'EM: [ 4:37 DK ]
Aziza Mustafa Zadeh - Always

STRANA 6'EM: [ 5:27 DK ]
Tigran Hamasyan – Qers

STRANA 7'EM: [ 4:53 DK ]
İbrahim Maalouf - Tru Sorry

## 2 CAZ Û JIN S.6

STRANA 1'EM [ 2:58 DK ]
Tara Mamedova-Çûko Rebeno

STRANA 2'YEM [ 2:43 DK ]
Melba Liston û Dexter Gordon - Mischievous Lady

STRANA 3'YEM: [ 1:21 DK ]
Melba Liston, Start Swingin

STRANA 4'EM: [ 3:59 DK ]
Melba Liston and Her Bones- You Don't Say

STRANA 5'EM: [ 3:19 DK ]
International Sweethearts of Rhythm-
Tuxedo Junction

STRANA 6'EM: [ 2:53 DK ]
International Sweethearts of Rhytm-I Left My Man

STRANA 7'EM: [ 2:06 DK ]
International Sweethearts of Rhytm-Jump Children

STRANA 8'EM: [ 3:24 DK ]
Nina Simone-Love Me Or Leave Me

STRANA 9'EM: [ 4:40 DK ]
Nina Simone-Mississippi Goddam

STRANA 10'EM: [ 1:17 DK ]
Meryem Xan-Mihemedo Roni

## 3 CAZ Û ASTENGÎ S.11

STRANA 1'EM: [ 2:58 DK ]
Tara Mamedova - Çûko Rebeno

STRANA 2'YEM: [ 04:34 DK ]
Ruşen Alkar –Hêdî Hêdî

STRANA 3'YEM: [ 03:42 DK ]
RayCharles-Georgia On My Mind

STRANA 4'EM: [ 03:09 DK ]
Art Tatum –Tea for Two

STRANA 5'EM: [ 02:15 DK ]
Art Tatum -TigerRag

STRANA 6'EM: [ 02:55 DK ]
Ray Charles- I Got a Woman

STRANA 7'EM: [ 04:19 DK ]
Ray Charles - What'd I Say




## 4 SERPÊHATÎYA CAZÊ LI TIRKÎYEYÊ S.15

STRANA 1'EM [ 2:58 DK ]
Tara Mamedova-Çuko Rebeno

STRANA 2'YEM [ 3:18 DK ]
Duke Ellington- İn a Mellotone

STRANA 3'YEM: [ 2:45 DK ]
Spencer Williams Shim-Me-Sha-Wabble

STRANA 4'EM: [ 3:09 DK ]
Howard Lanin and His Orchestra - Black Bottom

STRANA 5'EM: [ 2:33 DK ]
Ayten Alpman - Passion

STRANA 6'EM: [ 2:35 DK ]
Dizzy Gillespie - That's Earl Brother

STRANA 7'EM: [ 2:27 DK ]
Fran Warren - They Can't Take That Away From Me

STRANA 8'EM: [ 3:48 DK ]
Sevinç Tevs - Longing For You

STRANA 9'EM: [ 2:17 DK ]
Louis Armstrong - What a Wonderful World

STRANA 10'EM: [ 2:33 DK ]
Anita Ellis - Put The Blame On Mame

STRANA 11'EM: [ 3:03 DK ]
Nükhet/Neşet Ruacan - Sentimental Journey



## 5 CAZA DÎPLOMATÎK S.20

STRANA 1'EM [ 4:42 DK ]
The Real Ambassadors - Cultural Exchange

STRANA 2'YEM [ 3:09 DK ]
The Champ - Birk's Works

STRANA 3'EM: [ 5:25 DK ]
The Real Ambassadors - They Say I Look Like God

STRANA 4'EM: [ 8:45 DK ]
Balalaika Jazz Ensemble - Dedushkina Svirel

STRANA 5'EM: [ 4:45 DK ]
Scott Bradlee's Post Modern Jukebox
feat. Melinda Doolittle – Toxic

## 6 FERASETA ŞAHÎ Û ABORIYÊ YA CAZÊ S.26

STRANA 1'EM [ 2:58 DK ]
Tara Mamedova – Çuko Rebeno

STRANA 2'YEM [ 5:21 DK ]
Oscar Peterson Trio - D&E

STRANA 3'YEM: [ 2:45 DK ]
Scott Joplin – Maple Leaf Rag

STRANA 4'EM: [ 2:57 DK ]
Jelly Roll Morton's Red Hot Peppers –
Jelly Roll Blues

STRANA 5'EM: [ 2:36 DK ]
Original Dixieland - One Step

STRANA 6'EM: [ 3:19 DK ]
Bix Beiderbecke - I'm Coming Virginia



# LI ROJHILATÊ CAZ

## 1

**AMADEKAR:** BENGÎ BERFÎN ODABAŞI-HAZAL ODABAŞI
**WERGER:** GULSUMA DEMIR



Merheba ji her kesî re, em bi rêzên bernameya Dem û Caz bi we re ne. Di beşa bi navê Li Rojhilatê Caz de, em ê îro bi we re qasê saeteke bi stranên ji Rojhilatê wextekî xweş derbas bikin.

Ez bêjerê we Haznî. Yên ku naveroka bernameyê amade kirine Berfîn Odabaşi û Hazal Odabaşi ne. Bernameya yekem ku ji aliyê Qad bo Çandê ve tê piştgirî dayîn û ji aliyê Swing Amedê ve tê amade kirin dest pê dike.

Em ê bernameya xwe bi strana Çûko Rebenoya ku Tara Mamedova dibêje vekin.

## STRANA 1'EM

## TARA MAMEDOVA – ÇUKO REBENO [2:58]

Em spasiyan xwe ji hemû kedkarên vê strana nuwaze re dişînin. Ji wê pergala rîtmê ku hûn di stranê de dibihîzîn re 'swîng' tê gotin. Bi xêra Swîngê di salên 1930î de muzîka Jazzê popûler bûye û ji xwe re cûreyeke reqsê/dansê a teybet afirandiye. Ev cûreya dansê, Diyarbekîr jî di nav de li gelek welatên li ser dinyayê, hê jî tê îcra kirin. Ji ber ku Swîng Amedê muzîk û dansa swîngê bi me da nas kirin û pêşengiya vê projeyê dikin em spasiyên xwe ji wan re dişînin. Û niha jî da ku hûn Jazza li Rojhilatê hîs bikin, em ji Dhafer Yousef stranekî guhdarî bikin.

## STRANA 2'YEM

## DHAFFER YOUSEFF - OF BEUTY AND ODD [6 DK 57 SN]

Bestekar, stranbêj û ûdvana Tûnisî Dhaffer Youseff dibêjê ku radyo ji bo wî dibistana herî girîng e. Spas ji bo Radyo Ameda ku radyovaniya klasîk dide berdewam kirin û ji me re deriyên xwe vekirin.

Dhaffer Youseff beriya çend salan bi vîrtozê klarnetê ê herî jêhatî ê Tirkiyê Hûsnû Şenlendirici re derketibû dikê. Em ê jî strana muzîkjenê biqedr ê Tirkiyê Îlhan Erşahîn a bi navê Karşi Yaka lê bixin. Projeya Îlhan Erşahîn a bi navê Wonderland, muzîkjenên ku ''Avaniya Kaotîk a Stenbolê Wek Warê Nuwazeyan' dibînin dide ba hev. De werin em strana mînaka fûzyona Jazzê ku li terasa Yakup 2ê bi awayekî zindî hatiye qeydkirî guhdarî bikin. Di vê stranê de Îlhan Erşahîn li Saksafonê, Alp Ersönmez li bas gîtarê Volkan öktem li daholê û Hûsnû Şenlendirici li klarnetê dide. Kerem bikin.

## STRANA 3'YEM

## WONDERLAND - KARŞI YAKA [7DK 22 SN]

Ji destpêkê heta niha, muzîka Jazzê bi awayekî domdar guheriye. Jazz cureyeke muzîkê a gerenî û azad e. Piraniya muzîkologan muzîkê wek a kevneşopî, klasîk û populer dikin sê şax. Lê ji ber ku muzîka Jazzê ji van her sê şaxan jî teybetmendiyan dihewîne, bi awayekî rasterast nakeve yek ji van şaxan jî. Em dixwazin îro straneke kevneşopî bi we bidin guhdarî kirin. Ev stranên ku me hilbijartine Fûsyonên Jazzê ku ji muzîkên rojhilatê û ji avaniya armonîk û rîtmîk a Jazzê pêk tên. Em we bi peyvên xwe aciz nekin û stranekê bidin guhdarî kirin da ku hûn fêm bikin. Em ji muzîkjenê Jazzê ê navdar û Îranî Mohsen Namjoo stranekî guhdarî bikin.

## STRANA 4'EM

## MOHSEN NAMJOO - TORANJ[6 DK 31SN]

Di dîrokê de weke piraniyan şaxê muzîkan, di muzîka Jazzê de jî serdestiya mêran hebûye. Mixabin gelek jinên jêhatî weke hemsalên xwe yên mêr eleqe û teqdîr nedîtîne. Werin em niha ji pîyanîsta Azerbeycanî ku xwediya melodiyên resen ên sedsala me Aziza Mustafa Zadeh strana bi navê Alwaysê guhdarî bikin.

## STRANA 5'EM

## AZIZA MUSTAFA ZADEH - ALWAYS [4.37 DK]

Dema ku Azîza sê salî bûye bi bavê xwe re li ser dikê dest bi jixweberiya vokalê kir. Dûre jî di hejdeh saliya xwe de xelata Thelonious Monk Piyanoyê wergirt. Jineke din a ku weke Azîza di ciwaniya xwe de gelek karên serkeftî kirine Tigran Hamasyan e. Her çiqas Hamasyan niha sî û sê salî jî bê niha xwediya gelek xelat û deh albûman e. Hamasyan li Ermenîstanê hatiye dinyayê û tê zanîn ku kalikên wê ji Qersê koç kirine. Kerem bikin em niha li straneke wê ya bi navê Qers 1ê guhdarî bikin.

## STRANA 6'EM

## TIGRAN HAMASYAN – QERS 1 [5.27DK

Em dixwazin bernameya xwe bi straneke Îbrahîm Maaloufê ku bi Apê xwe Amîn Maalouf re xwediyê heman paşnavî ye bi dawî bikin. Maalouf di mijara enstrûman hilbijartinê de li ser rêya bavê xwe diçe, bavê wî jî trompetvanekî navdar û mûcîde trompeta bi çar pîstol a Îbrahîm Maalouf e. Îbrahîm Maalouf bi xêra çar pîstolan dikarê muzîkeke Jazzê ku nîvdengên Muzîka Tirkî dihewînî biafirîne. Strana ku wî, muzîka wî û bi avahiya xwe ya melodîk welatê xwe Lubnanê bi me dide hîs kirin True Sorry bi we re ye.

## STRANA 7'EM

## AZIZA MUSTAFA ZADEH - ALWAYS [4.37 DK]

Em spasiyên xwe ji hemû muzîkjen û hunermendên ku giredayî kevneşopiyên xwe, û li ser van kevneşopiyan zêdekirinan dikin, dişînin. Hûn her hebin.

Mala wan hemû kesên ku guhdarîya me kirine ava. Bimînin di nav hêvî û bextewariyê de!

# CAZ Û JIN

## 2

**AMADEKAR:** BARAN OĞUR-ILGIN NAZLI DEMIR
**WERGER:** HIŞYAR AYDIN



Merheba ji her kesî re, em niha bi rêze bernameyên radyoyê yên Dem û Cazê li gel we ne. Di vê bernameya bi navê Caz û Jinê de em ê li ser " di cazê de cih û têkoşîna jinê " biaxivin. Ez pêşkêşvana we Gulê. Ên ku naveroka vê bernameyê dagirtine jî Baran Ogur û Ilgin Nazli Demir in. Yekem bernameya "Dem û Caz"ê ku ji hêla Swing Amedê tê amadekirin û pişgiriyê ji "Qad ji bo Çand"ê distîne dest pê dike.

## STRANA 1'EM
## TARA MAMEDOVA-ÇÛKO REBENO [2:58]

Rolên zayenda civakî çawa ku di her qada jiyanê de cihekî mezin digirin, mixabin di pêkanîna muzîka cazê de hew qasî cih digirin.Muzîka caz jî qadeke wisa ye ku jin mecbûr dimînin xwe radestî hin stereotîpan bikin û di pêkanîna muzîkê de pêrgî gelek zahmetiyan tên. Di demên destpêkê yên cazê de, rolên jinan bi tenê stranbêjiya orkestrayan bû herî zêde karibûn di nava komê de bibûna piyanîst, wekî din hemû rê ji bo wan girtî bûn.

Weke ku me got, di nav komên ku ji mêran pêk dihatin bi tenê jin karibûn bibûna piyanîst. Nivîskar Judith Tick, "guncanbûna" piyano û arpê ji bo jinan û lihevhatina wan û femînenbûnê wiha şîrove dike "îfadeyên li ser rû û tevgera laşî ji bo portreyên ku ji xanimeke muzîsyen belav dibin nabin asteng". Her wiha, di salên 1920'î de lêdana piyanoyê ji bo jinan dihat wateya, di malê de di dema çayvexwarinê de sembola perwerdehiyê an jî sekneke çandî. Tevî ku di demên piştî wê de komên jinan yên serbixwe ava bûn, jin ji rola keça malbata xwe ya şîrîn derbasî roja jineke muzîsyen nebû.

Yekem mînaka ku dinav komeke ku ji mêran pêk tê de li piyanoyê nade, Melba Listoneya ku li trombonê dide ye.

Melba Listona ku di sala 1926'an de li Kansas Cityê hatiye dinê, dema ku 7 salî ye di dibistana seretayî de derfeta wê çêdibe ku gelek amûran hilbijêre, lê ew trombonê dineqîne. Paşê dema ku behsa wan deman dike wiha dibêje : " Dema ku min trombon dît ez fikirîm bê ew çi qasî xweşik e, û min xwest ku ez yekê ji xwe re bikirim. Kesî ji min re negot ku hostetiya wê gelekî dijwar e. Tekane tiştê ku zanibû ew xweşik bû û min yek ji wê dixwest.
Bi tenê piştî salekê di radyoyeke herêmî de bi qasî performanseke solo pêk bîne, bibû hoste.
Dema ku bû 16 salî biryar da ku bibe muzîkjeneke profesyonel û tevî yekîtiya muzîkjenan bû. Bû endameke Koma Los Angeles Lincoln Theaterê. Bi ser de bi orkestraya International Sweethearts of Rhythmê re peywendî danî, û xwest ku koma Melbayê tevî wan bibe.
Paşê, Melba hem weke muzîkjen û hem jî weke aranjor tevî koma mezin ya Gerald Wilsonê ku hem bestekar û hem jî trompetvan e bû. Di heman demê de bi Dexter Gordonê saksofonvanê tenor re xebitî û herduyan bi hevre strana Mischievous Lady tomar kirin. Gordon vê stranê ji bo pesindayina wê nivîsîbû. Kerem bikin

## STRANA 2'YEM
## MELBA LISTON Û DEXTER GORDON - MISCHIEVOUS LADY [2:43]

Paşê, Melba bi kesên navdar ên weke Dizzie Gillespie û Count Basie re xebitî.
Piştî wê jî tev li koma muzîkê bû, ew koma ku dê di gerra başûrê Emerîkayê de bi Billie Holidayî re cih bigire.
Ev, di kariyera Melbayê de demeke zafh nexweş û dijwar bû.
Vê komê bêhtir sitîla Bebopî ya cazê pêk tanî ku ji bo dansê ne kêrhatî bû û bêhtir weke muzîka muzîkjenan dihat binavkirin. Melba Liston jî di bîranînên xwe de dibêje ku guhdarvan ji bo vê muzîkê ne amade ne, ev muzîk li gorî wan gelekî li pêş e û temaşevan pêhtir muzîka dansê dixwazin. Behsa temaşevanan jî dike, dibêje; her ku em bi ber başûr ve diçin kêm dibin, dema em digihêjin başûrê Carolinayê kes namîne.Di vê pêvajoyê de xweşbîniyên wê yên ji bo endîsturiya muzîkê reşbûn. Marûzî cudakerî, tacîz û hetta tundiya zayendî bû. Dîsa li gorî vegotina wê em fehm dikin ku: Bi rojan bê pere dimînin, di otobêsa komê de radikevin û radibin, hêrahiya xamkêsanê dixwin û encax piştî çend rojan ji Los Angelesê pere ji wan re tê şandin.

Piştî vê gerê Melba ji endîsturiya muzîkê dixeyide û dest pê dike di fîlmên Hollywoodê de lîstikvaniyê dike û debara xwe bi lîstikvaniyê dike. Niha em ê li straneke guhdarî bikin ku di sala 1945'an de ji performanseke wê ya fîlmê "Ladies in the Groove" hatiye girtin. Start Swingin.

## STRANA 3'YEM
## MELBA LISTON, START SWINGIN [1:21]

Melba Listona ku bi eşqeke mezin lê dide; di kovar û rojnameyan de di derheqê jiyana xwe ya taybet de gelek daxwiyanî dabûn.Listona ku dibêje muzîk rewşa min ya derûnî diguherîne û li hember hemû dijwariyên jiyanê ez xwe tavêjim bextê muzîkê dibêje gelek caran dema ez li sehalbûnê digerim ez xwe dikşînim nav kakilê xwe. Listona ku 3 caran zewiciye û veqetiyaye dibêje her dema ku ez zewicandîbûm min xwe dixist nava malê û bi tenê ji bo ez bibim “hevjîneke baş” min hewl dida. Di wê serdemê de weke kar muzîkjenbûn û pêkanîna jiyana malbat û hevjîniyê normal nedihat dîtin, ev tiştekî eşkere bû. Her kesê ku Melba Listonê di van navbêrên kurt de di cemaeta muzîkê de didît bi henakan digot “ xuya ye Melba dîsa azip maye”. Ev jina ku muzîkjen, bestekar û aranjor e di dema me de jî dibe îlham ji bo însanan. Strana di rêzê de ji albûma Melba and Her Bones tê ku Liston bi tenê ne li trombonê daye di heman demê de yekem albûma ku aranjoriya wê kiriye û tomarkiriye. You Don’t Say.

## STRANA 4'EM
## MELBA LISTON AND HER BONES- YOU DON'T SAY [3:59]

Di Amerikaya 1930’an de ji bilî newekheviya zayendiya civakî nijadperestî jî dijwariyeke mezin bû. Di vê demê de tu jinbî û tew tu Afro-Amerîkayî bî, bi muzîkê re têkildarbûn û weke kar îcrakirina wê bi serê xwe berxwedanek bû. Orkestraya International Sweethearts of Rhythm ku di sala 1937’an de ava bûye, belkî di wê demê de hay ji girîngbûna wê berxwedanê nîn bû. Ew xwendekarên ku wê demê bi tenê perebidestxistina ji bo perwerdehiyê bû, em nizanin bê texmîn kirine ku wê koma wan bibe komeke jinan ya ku ji gelek nijadan pêk bê yan na.

International Sweethearts of Rhythma ku cudahiya rengê laşî, meyla zayendî û zimanê zikmakî tê de nîn bû, di demeke kin hemû jinan di xwe de heband, bi saya muzîkê di nava kîtleyan de belav bû û bû orkestrayeke hêvî dide hemû jinan. Tuxedo Junctiona ku klasîkeke cazî ye em ji wan guhdarî bikin.

## STRANA 5'EM
## INTERNATIONAL SWEETHEARTS OF RHYTHM-TUXEDO JUNCTION [3:19]

Di herba duyemîn ya cihanê de piştî ku mêran vexwendin leşkeriyê guherîneke sedsale pêk hat. Cihana kar ku mêr lê serdest bûn sektora muzîkê jî diheband, bi çûna mêran a leşkeriyê, bi tevahî jinên ku diviya ‘li malê’ bin, ji bo ku pereyan qezenc bikin dest bi kar kirin.

Orkestrayên ku li eywanên muzîk û dansê sahne digirtin ji hev bela bûn. Tam di vê demê de International Sweethearts of Rhythmê  di eywaneke bi navê "Cotton Club" de kar bi dest xist. Ev eywan yek mekanên ji wan mekanên herî bi nav û deng bû. International Sweethearts of Rhythma dest bi geran kir di serî de nehatin dîtin  lê tevî vê jî ew firsend kete destê wan ku serkeftina muzîka xwe bidin nîşandan. Di heman kêliyê de dê rojnameyan wiha binivîsandana “Bi qasî mêran serkeftî ne”. Her çi qas ev hevok nexweş xuya bike jî li gorî serdemê gelekî girîng bû. Erê, jin hebûn û dê hebûna wan berdewan jî bikira. Niha jî em ê ji koma wan li “ I Left My Man”ê guhdarî bikin.

## STRANA 6'EM

## INTERNATIONAL SWEETHEARTS OF RHYTM-I LEFT MY MAN [2:53]

Ji  bo gerên komê dijwariyê mezin ev bûn; ji bo ku xwendekar bûn diviya perwerdehiya xwe bidomandana hem jî li başûr sekna nijadperestiyê him bi him zêdetir dibû. Nijadperestî zordariyeke wisa bû ku gelek caran ew marûzî wê diman û hin deman jî ew têk dibirin. Restorantên ku servîs ji reşikan re venedikirin, otelên ku ew venedihewandin, tiwaletên ku destûra bikaranînê nedihatin dayîn. Lê li hemberî van tiştan, jinên ku dixwestin muzîkên xwe pêk bînin.

Helen Jones Woodsê 96 salî ku yek ji endamên yekem e, du meh berê ji ber covîdê koça xwe ya dawîn kir. Niha strana di rêzê em ê ji bo bîranîna wî lê bidin. Jump Children.

## STRANA 7'EM

## INTERNATIONAL SWEETHEARTS OF RHYTM-JUMP CHILDREN [2:06]

Tevî ku ev kom di sala 1949'an de ji hev bela bûye jî, li cihanê mîna semboleke li dijî newekheviyê û nijadperestiyê.

Di wan salan de Nina Simoneya ku qabiliyetên xwe yên xwezayî di dêran de rê dida, hîna 12 salî bû. Di dema şiyaneke xwe ya li dêrê de, ji bo ku cih ji yên spî re vekin dê û bavê wê ji cihên pêşî yên eywanê tên rakirin, û ji bo paşiya eywanê tên şandin, ev bûyer yekem tişt bû ku  ew pêrgî nijadperestiyê dihat. Simoneya matmayî û bihêrs, heta ku dê û bavê wê li cihê xwe yê berê venegeriyan lêdanê red kir û sekinî. Ev bûyer gelekî girîng bû di nav bîranînên wê de û belkî jî azweriya wê ya gur a ji bo parastina Reşan li Amerîkayê jî di wê kêliyê de derket holê.

Ji bo jiyana xwe bidomîne di 1954'an de li kûlûbeke şevê stranan bibêje, beşdarî pêşbaziyan bû. Ji ber ku ji dêya xwe ditirsiya dixwest vê rewşê ji wê bi dizî bike. Ji ber vê yeke navê xwe weke Nina guherand ku ev nav di spanyolî de tê wateya keçika biçûk. Piştî vê yekê, di derbarê vî dengê şîfonî yê stranbêj û piyanîsta nûgihaştî gelek galegal belav bûn. Dema ku dengê wê yê xumamî û hostetiya wê ya piyanoyê gihaştin hevdu, di demeke kurt de kûlup mişt tije dibû. Hê di 24 saliya xwe de bala endîsturiya plakan kişandibû ser xwe. Niha jî strana wê ya giragira ya albûma wê ya yekem bi we re ye " Love Me Or Leave Me",

## STRANA 8'EM

## NINA SIMONE-LOVE ME OR LEAVE ME [3:24]

Dema ku Simone li kûlubên cazê yan jî di konseran de lê dida, ku temaşevanan bi baldarî li muzîka wî guhdarî nekirana, gelekî hêrs dibû, hişyarî dida wan û hetta lê dixist û diçû. Di xwezaya wê de protesto hebû. Di salên 1930-40'î de li Carolinaya Bakur, jinbûn ne tiştekî hêsan bû. Simone fam kiribû bê ji bo moriv li ser lingan bimîne divê raperînê pêk bîne.
Ninna Simoneya ku piştî kuştina Medgar Eversî ya di 1963'yan de ya li Mississippiyê û êrîşa li dêrê ya li Alabamayê, ji hêrsan dîn bû, yekem strana xwe ya protest nivîsî. Û bi hezaran însan li konseran vê stranê bi hev re xwend.

Dick Gregoryê aktîvîst vê strana ku di sala 2019'an de kete lîsteya Sîcîla Tomarê ya Neteweyî ya Amerîkayê û kete ewlehiyê, wiha tarîf dike :
"Bala min kişand. Tişta ku dikir cihêreng bû. Di jinan da tiştekî cuda heye, dema tu li tiştên ku hatiye serê mêrikên reş dinêrî, tevî wê jî bi wan re ew cesareta ku bibêjin Mississippi Goddam tune ye. Hûn zanin, piştî ku wê jina biçûk behsa pirsgrêkên xwe pir û pê ve her kes çiqasî bextewar bû? Me hemûyan dixwest em bibêjin. Wê gotibû " Mississippi Goddam"."

### STRANA 9'EM

## NINA SIMONE-MISSISSIPPI GODDAM [4:40]

Nina Simone piştî serkeftina xwe ya Mississippi Goddamê bi gelek stranên protest, li çalakiyan xwe rê da. Nina Simoneya ku dibêje ev hilbijartina min e, di gotûbêjeke xwe de şexsiyeta xwe ya aktîvîst wiha vedibêje " Min xwe mecbûr hîs kir ku ez vêya bikim. Yanî ev rola min e. Carna ez dibêjim xwezî wisa nebûna. Ez bawer im, hunermendên ku tu derdê wan yê peyamdayînê tune bin, bêhtir kêfxweş in. Lê diviya ez bi Ninayê re bijîm û ev tiştekî gelekî zor e. Mixabin ev jina ku di rola xwe ya hunerê de gelekî deng derxistiye, di rola xwe ya nav malê de ne wisa bû. Ninaya ku ji hêla hevjîn û(di heman demê de) menejerê xwe Andy Stroud dûçarî tundiya derûnî bûye, ne karibûye ve bisekinîne û ne jî dev ji wî berde.

Dijwarbûna jinbûnê bi tenê ne çarenûsa vê erdnîgariyê bû. Çîroka Meryem Xana ku bi dengê xwe muzîka kurdî dixemiland û jiyana xwe bexşî hunerê kiribû jî ispateke vêya ye. Yekem stranbêja jin ku stranên kurdî tomar dikir hîn di deh saliya xwe de bû şahidê gelek zilman. Di demeke wanî de ku şerê yekem yê cihanê dest pê kiribû; li herêmê gelek raperîn pêk hatibûn, komkujî û mişaxtina ermen û suryanan pêk hatibû, ew bi muzîkê re eleqedar bûbû. Meryem Xana ku li dîwanan stran digotin, di civînekê de bi wî dengê xwe yê belorî Mihemed Bedirxan xistibû bin bandora xwe, û di demeke kin de ew zewicîbûn. Lê belê, ji ber tevna civakê û bandora malbatê ya li ser " rola jinê, Bedirxan û malbata xwe xwestibûn ku êdî Meryem Xan bes stranan bibêje. Pêşnêriyekê pêşniyarî wê kirin: Ya evîn an jî huner. Meryem Xana ku digot " Ku ez bêhuner bimînim, ez ê bimirim" hê di 20 saliya xwe de ji hevjînê xwe veqetiya û demeke dirêj derneket dîwanan. Vê çîroka xembar jî wiha kiriye beste û aniye ser ziman.

### STRANA 10'EM

## INTERNATIONAL SWEETHEARTS OF RHYTM-JUMP CHILDREN [2:06]

Weke hûn dibînin, cihbidestxistina jinê ya di cihana muzîkê de, weke her qada jiyanê têkoşîneke dijwar xwestiye. Em niha tên dawiya bernameya xwe. Spasî bo we, ji bo ku we li me guhdarî kir. Di nava hêvî û kêfxweşiyê de bimînin.

# CAZ Û ASTENGÎ

## 3

**AMADEKAR:** MEDIYE ALKAN-LEYLA EREN
**WERGER:** HIŞYAR AYDIN



Merheba ji her kesî re, em niha bi rêze bernameyên radyoyê yên Dem û Cazê li gel we ne. Di vê bernameya bi navê Caz û Astengî de em ê li ser bandora başker a muzîkê û hunermendên ku xwe ji ser astengan gav kirine, biaxivin. Ez pêşkêşvanê we Haznî û yê ku naveroka vê bernameyê dagirtine jî Mediye Alkan û Leyla Eren in. Sêyem bernameya “Dem û Caz”ê ku ji hêla Swing Amedê tê amadekirin û pişgiriyê ji “Qad ji bo Çand”ê distîne dest pê dike.

Bernameya me dê bi strana kurdî ya bi navê Çûko Rebeno ya ku ji hêla Tara Mamedova ve tê xwendin, dest pê bike.

## STRANA 1’EM
## TARA MAMEDOVA - ÇÛKO REBENO [2:58]

Em ê demeke wisa bi we re parve bikin ku em ê bi hev re hîs bikin bê çawa muzîk ji laşî bêhtir giyanî xweşik dike. Niha em ê li muzîkjen Rûşen Alkar a ku tarza caza kurmancî û çanda me bi hev re hêraye û bi dil û hestên xwe şewqa hêla me diherikêne guhdarî bikin; strana Hêdî Hêdî li gel we ye.

## STRANA 2’YEM
## RUŞEN ALKAR –HÊDÎ HÊDÎ [04:34]

Piştî vê strana xweş, em hinekî jî li ser muzîk û astengdariyê biaxivin. Dema ku em li bandora muzîkê ya erênî ya li ser kesên xwedî pêdiviyên taybet a sedsalan difikirin, nabe ku em behsa muzîkjen anjî danskerên xwedî pêdiviyên taybet nekin. Wekî din, fêde tê de heye ku ji dêvla peyva “asteng” merev gotina “pêdiviyên teybet” ku hîn nermtir e, bi kar bîne. Muzîk bandornî giran li ser kesên xwedî pêdiviyên taybet(bi taybetî kesên otîzmî) dike; danûstendinên hestiyarî, kêmkirina pirsgrêkên tevgerî û jiyandina hesta serkeftinê. Belkî jî van mirovana, ji bo hin kêmasiyên ku di hin qadan de jiyane, ji holê rakin; pişta xwe sipartine muzîk û tesîra muzîkê ya başker, merev nizane. Bi taybetî, lêdana enstirumanê, strangotin an jî danskirin, karin hesta serkeftinê bidin jiyandin. Îja ka kî ne ev muzîkjen?

Ka werin em têkevin nav pelên dîrokê: Di vê beşê de em ê behsa du muzîkjenên girîng bikin, ê yekem Art Tatum, navê wî yê rast Arthur Tatum Jr ye. Yê dinê jî Ray Charles Robinson e. Di van herdu hunermendan de jî kêmasiya dîtinê heye. Helbet muzîka ku ji çavan bêhtir guhan divê, qadeke wiha ye ku bi sedsalan bala kesên xwedî kêmaniyên dîtinî, kişandiye ser xwe. Heke hûn bibêjin bêyî dîtinê mirov çawa kare lêbide, ez ê ji we re bibêjim ku di kesên ku nabînin de sehekên destdan û bihîstinê gelekî xurt in, divê hûn vê zanibin. Tevî wê, ji ber ku hîsên wan gelekî xurt in, em karin bibêjin ku eyn giyanên xwe jî tevî muzîkê dikin. Bi destûra we, em ji van stranbêjên efsanewî straneke guhdarî bikin û paşê bidomînin. Ray Charles, Georgia On My Mind.

## STRANA 3’YEM
## RAYCHARLES-GEORGIA ON MY MIND [03:42]

Arthur Tatum Jryê ku hîn dema pitik e, ji ber kataraktê hema hema qet nabîne, li Toledoya eyaleta Ohioyê ya Amerika’yê hatiye dinê, hîn di temenê biçûk de dest bi lêdana piyanoyê dike. Paşê li Clevelandê bi awayeke profesyonel didomîne. Heta ku di 1932’yan de bar dike diçe New Yorkê. Arthurê ku ceribînên xwe yên ewilî li ser stranên ku lê guhdarî dike û yên ku notayên wan aîdî diya wî ne dike, di demên pêş de teknîkên zûtir û bandêrtir ên lêdanê keşif dike. Ji ber ku hunera wî ya lêdana bilez heye, bi awayeke xwezayî, bi piyanîstên dinê re nikare lêbide û bi tena serê xwe dimeşe. Plakên wî yên kevirîn jî hene ku bi kontrbassvan Slam Stewart û gîtarîst Tiny Grimesî re tomar kirine. Piyanîstê navdar di 1956’an de li Kalîforniyaya Los Angelesê ji ber xerabbûna gurçikên xwe jiyana xwe ji dest daye. Niha strana Tea for Two ji Art Tatum bi we re ye.

## STRANA 4'EM
## ART TATUM –TEA FOR TWO [03:09]

Divê ez ji we re behsa bîranîneke xwe bikim. Dema ez di dibistana seretayî de di pola 4'em de bûm, çîroka darek û şaredariyê hate bîra min. Dareke ku ji bo çêkirina peyarêkê hatiye jêkirin. Di heman demê de dareke ku di sînoran de hilnayê. Dara gewre; ji navê ber bi jêr ve tê jêkirin û weke xemla peyarêkê tê danîn. Pir diçe, hindik diçe; dibe zivistan. Hîn ku dibînin dibe bihar. Bi hatina biharê re, dara me ya efsane çavîkan dide û şaxên wê gur dibin. Ji her derê xwe çavîkan dide. Kî diçe û tê matmayî lê dinêre. Tiştê ku ez dixwazim bibêjim, tevî ku yên ku wê jêkirine wê bi armanceke dinê bi kar bînin jî, wê dev ji jiyanê berneda, dev ji mezinbûnê berneda û heta dev ji hêlînbûnê jî berneda. A va ye, hemû mesele ev e. Weke Arthur Tatumî, weke vê darê, bêyî em dev jê berdin, bi tekoşînê divê em bi jiyanê bigirin. Guhdarvanên xwoşewîst, em hinekî jî guh bidin gotinên muzîkjenên dinê, bê ka ew derheqê Arthurî de çi dibêjin.

Oscar Peterson wiha gotiye: " Rojekê bavê min hat malê û got ez dixwazim ji te re plakekê vekim. Gelekî kêfa min hatibû û min guhê xwe belî pîkapê kir. Plaka ku vekiribû strana "TigerRag" ya Art Tatumî bû. Piştî ku min li vê stranê guhdarî kir, du mehan min destê xwe neda piyanoyê. Her şev ez digiriyam. Bi şevê, dema ez diketim nav nivînan, min xewnereşk didîtin, mirovek çawa dikare hewqasî mukemmel li piyanoyê bide. Ji ber ku teknîk taybetiyeke wisa ye ku merev kare wê çêbike. Lê belê, teşeya fikirîna armonîk û rîtmîk ya Arthurî bêhempa ye."
Ev jî gotinên Teddy Wilsonî ne: "Belkî ev hinekî karibe Art Tatumî vebêje. Bi tenê piyanoyekê li odeyekê bi cî bikin û bang li hemû piyanîstên sofîstîke yên cazê bikin, destûr bidin wan ku li ber Art Tatumî li piyanoyê bidin. Dawiyê bihêlin bila Art lêbide. Piştî lêdana Artî, ew piyanîstên cazê yên sofîstîke ku we ew vexwendibûn, dê çêjeke amator bidine we."
Û herî dawîn Charlie Parker: " Xwezî min karibûna bi qasî destê rastê yê Tatum lêbida."

## STRANA 5'EM
## ART TATUM -TIGERRAG [02:15]

Heke bi dilê we be, em hinekî behsa hunermendê xwe bikin ku xwe ji ser astengên dinê gav kiriye. Ray Charles Robinsonê ku di navbera 1930 û 2004'an de jiyaye, muzîkjen, piyanîst û di heman demê de hostê rîtim û bluesê ye. Li Albany-Georgiyaya Amerîkayê hatiye dinê. Hê di 5 saliya Ray Charlesî de birayê wî dikeve kuwetê û dimire. Piştî wê bi çend salan, di 7 saliya xwe de ji dîtinê mehrûm dimîne. Sedema korbûna wî jî nexweşiya glokomê ye ku di nav gel de jê re dibêjin 'tansiyona çav anjî ava reş'. Helbet di vê nexweşiyê de, dema ku teşxîsa vê nexweşiyê zû neyê kirin, di dîtinê de kêmasiyên mayinde dertên holê. Lê belê, Ray dîmenê bi temamî wenda nekiriye. Li gorî hin rîwayetan, di 7 saliya xwe de ji hevalekî xwe diheside û dikeve nava jiyana muzîkê, mirina birayê wî jî ew bêhtir kişandiye nava wê. Rayî li Dibistana Ker û Koran ya Floridayê perwerde girtiye, li wê derê elfabêta braîllê hîn bûye û di heman demê de dest bi lêdana enstirumanan kiriye û gav avêtiye nav jiyana muzîkê. Piştî salên dibistanê, jiyana xwe weke muzîkjenekî domandiye. Kesê ku Ray navdar kiriye, Ahmet Ertegun e ku di heman demê de xwediyê Atlantic Recordsê ye. Di dema berdariya xwe de, demeke dirêj bi bêhişkeran re têkoşiyaye, asoxî wî ew têk birine. Jiyana Rayî di 2004'an de, bûye mijara fîlmekî ku navê wî jî "Ray" e. Actorê ku rola Rayî dilîze Jamie Foxx e. Bi saya vî fîlmî, Jamie Foxx, di 2005'an de, xelata Akademiya Lîstikvanê Mêr yê Herî Baş girtiye.
Dîsa derhênerê fîlmê 'Parêzerê Şeytên', Taylor Hackford gotiye, ji bo ku ez fîlmê "Ray" ku jiyana hunermendê cazê yê navdar Ray Charlesî ye, bikşînim ez 15 salan sekinîm.
Hackfor, di heman demê de ji bo Ray Charles wiha gotiye: "Mirovekî gelekî dijwar e. Di serî de sar disekinî, paşê bi min bawer bû û di derheqê jiyana xwe de bersivên rast dan min. Wî bixwe lîstikvanê fîlmî yê sereke Jamie Foxxî di azmûnên zehmet re derbas kir."
Naxwe, tevî hemû zanyariyan, em li strana I Got a Womenê guhdarî bikin ku ji fîlmê Rayê hatiye girtin.

## STRANA 6'EM

### RAY CHARLES- I GOT A WOMAN [02:55]

Belê, heta niha me behsa bandora muzîkê ya li ser kesên xwedî pêdiviyên taybet û dahiyên di nav sektora cazê de ne kir. Bandora dansê ya li ser mirovan û mirovên xwedî pêdiviyên taybet ji serdemên pêşîn ta îro ji bo ku mirov hestên xwe şanî derve bidin, hatiye bikaranîn. Gelek bandorên wê hene, bi awayeke xerîb mirov karin xwe deşarj jî bikin û hetta xwe bi vê bextewar jî dikin. Û êdî ev bandor xwe dispêrin daneyên zanistî jî. Bifikirin, mirov nikarin bi hemû zimanên li ser dinê biaxivin, bi tenê du zimanên hevpar hene: Muzîk û dans. Û em karin bibêjin ku ev rewş hema hema li ser hemû mirovan, heman bandorê dike. Mînak, dema ku ez dans dikim ez xwe mîna çivîkekê hîs dikim. Em karin rîtmê di her kêliya jiyana xwe de hîs bikin. Ka em ji Ray Charles stranake dinê guhdarî bikin.

## STRANA 7'EM

### RAY CHARLES - WHAT'D I SAY [04:19]

Di nivîseke ku me xwend de wiha dihat gotin : "Li hêlekê mirovên ku çarenûsa xwe qebûl dikin hene, li hêlekê jî yên ku dibêjin "guherandina vêya di dest min de ye" û kontrola jiyana wan di destê wan de ye hene. Yên ku çarenûsa xwe bi xwe dinivîsînin, dibin fîgurên xwedî îlham, seroknî serkeftî an jî mirovên afirîner, "yên ku çarenûsa xwe qebûl dikin" heta dawiya emrê xwe li cihê ku lê ne disekinin." Li gorî me mînakên vêya, ev herdu hunermendên me, xwedî kêmaniyên dîtinê ne û xwe ji ser hemû klîşeyan gav kirine û li cihanê bûne kesên bibandor û navdar.
Asteng em in, fikirên di serê me de ne; bi van gotinan em hatin dawiya bernameya xwe û me bernameyeke xweş û zewqdar buhurand. Spasî bo hemû guhdarvanan. Bimînin di nav hêvî û bextewariyê de. Êvar baş.

# SERPÊHATÎYA CAZÊ LI TIRKÎYEYÊ

4

**AMADEKAR:** FILIZ KAYA KAPLAN
**WERGER:** GUL MERVE EKINCI



Silav û rêz ji we hemûyan re. Em bi rêzika bernameya Dem û Cazz a radyoyê bi hev re ne. Em ê di vê beşê de, ku navê beşê Serpehatîya Cazzê ya li Tirkiyeyê ye, li ser cihê cazzê ya di çand, hûner û jiyana şahîyê de biaxivin. Ez pêşkeşvana we Gulê. Amadekara naverokê jî Fîlîz Kaya ye. Çaremîn bernameya Dem û Cazz ku ji alîyê 'Qad ji bo Çandê' ve piştgirî hate dayîn û ji alîyê Swîng Amedê ve hate amadekirin destpê dike.

## STRANA 1'EM

## TARA MAMEDOVA-ÇUKO REBENO [2:58]

Em bi pirsa caz kengî hat Tirkiyeyê destpê dikin.  Mînakên Cazzê yên pêşîyê heta salên 1920an diçe. Di wê serdemê de muzîka cazzê rasterast ji Amerîkayê nayê, ji Ewropayê tê. Bi pêvajoya Rojavayîbûnê ya ku di Împaratoriya Osmanî de destpê kir, mînakên ewil ên muzîka cazzê jî wekî hema hema hemû şaxên hunerê, ji Ewropayê fêr dibin.
Li Tirkiyeyê pêşengên vê cureya nûh a muzîkê jî, muzikjenên Yahudî û Ermenî ku dûrî muzîka pirdengî ninin, dibin. Yek ji wan pêşangan ku muzîka cazzê tîne Tirkiyeyê perwerdehiya muzîka klasik girtîye û kemanê lê dide. Ev ciwan Leon Avigdor e ku di sala 1920an de li Parîsê li klûbeke şevê muzîka cazê nas dike û çawa ku vedigere Stenbolê derhal alto saksafonek dikire û fêrî lêdana wê dibe. Piştî wê jî quartetek(komeka çar kesî) ya bi navê Ronald's ava dike û li cihên şahîyê bernameyan çêdike.
Wexta ku dawîya salên 1930an dihat ku ew sal ji bo muzîka cazê salên zêrîn bûn, li cazza Tirkîyeyê jî Yahudî-Cihûyek rastî me tê: ev Gido Kornfilt e. Gido ku di 1909an de li Stenbolê hatiye dinyayê, li Berlînê ku bi malbatî li wir bicîh bûne perwerdehiya muzîkê digre. Gîdo li Berlînê ji berhemên muzikjenên navdar ên cazzê wekî Duke Ellington û Benny Goodman aranjmanan amade dike. Di sala 1933an de ji ber ku li Elmanyayê dijberiya Yahûdîtîyê zêde dibe malbat vedigere Stenbolê. Di vê demê de jî Gîdo derbasî Parîsê dibe û pêkanîna aranjman û mûzîkên fîlman berdewam dike. Dawîyê jî di sala 1936an de Gîdo vedigere Stenbolê û orkestraya cazê ku ji 10 kesan pêk tê ava dike û ew li deverekê navdar ê şahîyê yê bi navê Park Otelê bi profosyenelî bişev sahne digrin.

Madem me behsa muzikjenên cazê yên navdar yên Amerîkî kiriye, em guhdariya strana "İn a Mellotone" bikin ku ev stran di sala 1940an de ji bestekar û pîyanîst Duke Ellingtonê hatiye tomarkirin.

## STRANA 2'YEM

## DUKE ELLINGTON- İN A MELLOTONE [3:18]

Wexta em rêwîtiya pêşengên cazzê yên Tirkiyeyê dikin, li muzikjenekî Ermenî ku li Stenbolê hatiye dinyayê û navê wî Gregor Kelekyan e rast tên. Gregor di sala 1918an de bi çûyîna Parîsê bi mûzîk û dansê ve mijûl dibe û dikeve cihana şahîyê. Bi orkestraya ku li Parîsê ava kiriye welat bi welat digere. Gregor Kelekyan di sala 1937an de vedigere Stenbolê û li vir jî koma 'Gregor Jazz'ê ava dike û cihên şahî yên navdar sahne digre.

Herî dawîyê jî em bi muzikjenê Amerikî ku ew bûye sedema derketina cazê ya li Tirkiyeyê berdewam dikin. Ev Frederic Bruce Thomas e. Thomas di sala 1919an de ji Rusyaya Çarlık* tê li Stenbolê bicîh dibe. Li Şîşlîyê cihêkî şahîyê ku ji navdarên wê serdemê ye bi navê "Stella" vedike. Stella ewqas dihat ecibandin ku Thomas gavek pêşdatir diçe û li cihekî mezin digere da ku tê de hem havînê hem jî zivistanê mirov karibe dans bike. Dawîyê di sala 1921an de li Taksîmê cihê bi navê Maksîm vedike. Maksîm klûba şevê ya lûks û ya pêşîyê ye ku li Stenbolê dansên tarza Rojavayê û jiyana şevê bi hev dide naskirin. Mişterîyên klûbê kesên ji Tirkiye, Levantenan û bîyanîyan e ku ji jiyana rojavayê hezdikin. Maksîm ku berê Cûmhurîyetê  sosyeteya Osmanî, hêzên dagirker û Rûs gelek diçûn, piştî Cumhurîyetê jî dibe mekanek pêşî yê xelekeka hewildana nûjenkirina Komara Tirkiyeyê ku çanda rojavayê tîne sosyeteya Stenbolê. Hetta mamosteyên dansê ku gelek ji wan Rûs in, li Maksîmê alîkarîya nifşên Stenbolî dikin ku dansên moda yên wekî fokstrot, shimmy, charleston hîn bibin.

Niha jî em straneka dansa trend ya wê serdemê, shimmyê, tînin pêşiya we. Em ê strana cazz a bi navê "Shim-Me-Sha-Wabble" ya Spencer Williamsê guhdarî bikin. Ev stran di sala 1917an de hatiye tomarkirin.

### STRANA 3'YEM
## SPENCER WILLIAMS SHIM-ME-SHA-WABBLE [2:45]

Wexta behsa dansê tê kirin, divê dansa charlestonê, ku bi mûzika cazzê tê kirin û dansa trend a wê serdemê ye jî, were behskirin. Di vê serdema ku Osmanîyan wekî salên dagirkirî binav dike de, Stenbol bajarek wisa ye ku ji gelek mîlletan mirovên curbecur tevlîhev jiyan didomînin. Bandorên wê cûrbecûrbûnê hêrî zêde li jiyana civakî tê hîskirin. Muzikjen û hunermendên ku ji welatên xwe revîyane, mekanên şahî ku wekî 'dansîng' tê binavkirin û tê de bi muzîkên cazzê dans tê kirin li ber çavê Stenbolîyan şîrîn dikin. Stenbolîyan ji meyxaneyên Galatayê zêdetir tercih dikin ku bi muzikên cazzê dansên wekî Charleston, black bottom, foxtrotê kêyf bikin. Bi vê tiştê, piştî Împaratoriya Osmanîyan, ji jiyana nûh re derîyek vedikin.
Em bernameya xwe bi straneka cazzê ku bi wê, dansa charleston tê kirin, dibirin. Em ê piştî stranê vegerin ser mijara dansing û dansa charlestonê ku di serdema cumhurîyetê de çawa cîh girtiye. Strana Howard Lanin and His Orchestra ku di sala 1926an de hatiye tomarkirin Black Bottom e.

### STRANA 4'EM
## HOWARD LANIN AND HIS ORCHESTRA - BLACK BOTTOM [3:09]

Faktorek din ku dildarîya dansê di civakê de belav dike, organên pêşeng ên medyayê yên wê serdemê ne. Organên medyayê, dansê wekî pêdivîyek jiyana nûjen dibînin û dansa çarlistonê, bi wêneyên ku ew xêz kirine, fêrî xwendekaran dike. Her çiqas di demen pêşîyê dijberên dansê derketibin jî, bi demê re li Tirkiyeyê eleqeyek berfireh derdikeve holê. Di vê tiştê de para mezin jî ew e ku li hêla hikûmetê dans weke çalakîyeke civakî tê pejirandin. Li Stenbolê ji xeynî dansîngan, li baloyên ku ji alîyê rêxistinên fermî û taybet tê damezrandin jî êdî dans tê kirin.
Gazînoya Şeredarîyê ya Taksîmê ku projeya cumhurîyetê bû û di sala 1939an de hatibû vekirin, heta sala 1967an ku hate hilweşandin jî wekî temsîlvana projeya nûjenbûyînê xîzmet dike. Di wê serdemê de gazîno ji gelek balo û konserên cazzê re mazûvanîyê dike.
Niha jî em biçin salên 1950an ku wê demê li Gazînoya Şaredarîyê ya Taksîmê Ayten Alpman konserên cazê dida. Em hemû wê bi muzîka popê nasdikin. De ka werin em strana wê ya ku di sala 1959an de derketiye, strana Passion Flowerê guhdarî bikin.

### STRANA 5'EM
## AYTEN ALPMAN - PASSION FLOWER [2:33]

Di serdema Cumhuriyetê de, da ku polîtîkayên çandî û reformên civakî yên li ser bingeha neteweperwerî û nûjenbûnê bigihîne girseya gel, Malên Gel tên damezrandin û li welêt dibin platformek girîng a muzîka cazê. Bi taybetî jî Mala Gel a Kadikoyê di wê serdema zû ya sahneya cazê de derdikeve pêş. Li Mala Gel a Kadıköyê, ku şandeyek cazê ya piçûk hate damezrandin; komên amator ên cazê, çalakiyên wekî Bernameya Rêwresma Cazê organîze dikin.

Di sala 1950an de Erdem Burî, Arîf Mardîn û orkestraya cazê ya serdemê bi hev re strana That'a Earl Brotherê ku ya Ray Brown e lêdidin û qeyda pêşî ya plaka 45an dikin. Ji ber ku em negîhan qeyda plaqê ku me behs kir, em ê strana That's Earl Brotherê ji Dizzy Gillespie guhdarî bikin.

## STRANA 6’EM
## DIZZY GILLESPIE - THAT’S EARL BROTHER [2:35]

Wekî ku me di serê bernameyê de jî dîyar kir muzîka cazê, pêşîyê ji ser Ewropa tê Tirkiyeyê. Tirkiye, muzîka cazê ya ku rasterast ji Amerîkayê tê jî, di dewra duyemîn a 1950an de nas dike. Tirkiye ku di nav bloka rojavayê de cîh girtiye, li herêmê dibe hevalbendê girîng ê Amerîkayê. Li alîyê din jî, polîtîkayên çandî yên Amerîkayê yên di serdema şerê sar de, derfetek dide ku Tirkiye cazzê wekî fermî nas bike. Di sala 1956an de bi avakirina “Bernameya Temsîlîyeta Çandî” pêvajoya danasîna muzika cazzê destpê dike û hunermendên cazê yên bijartî diçin welatên bîyan û danasîna muzîka cazzê dikin.
Di çarçoveya Bernameya Temsîlîyeta Çandî de navê ku hêrî pêşî tê Tirkiyeyê hunermendê trompetê yê navdar Dîzzy Gillespie dibe û di sala 1956an de li Stenbol û Enqereyê konseran dide. Navê girîng ê din jî Quincy Jones e ku di gera Dîzzy de jê re hevaltîyê dike.
Em niha jî li strana "They Can’t Take That Away From Me " ya hunermend Fran Warren, ku navê xwe

## STRANA 7’EM
## FRAN WARREN - THEY CAN'T TAKE THAT AWAY FROM ME [2:27]

Cûneyt Sermet ku li konsera Gillespieyê ya Enqereyê li paş wan lêkolîna notayên orkestrayê dike, ew ji nêz ve dişopîne, dibe alîkar ku Arîf Mardîn navdarê cîhanê Quincy Jones nas bike.
Piştî ku besteya Mardîn tê ecibandin, Quincy Jones ji dibistana navdar a cîhanê bursek ji bo Mardîn peyda dike. Û bi vî awayî Arîf Mardîn dibe navê navdarekî cîhanê. Arîf Mardîn li gel bestekarî û muzikjenîya xwe li Amerîkayê çêkeriya muzikê jî dike û wekî Norah Jones gelek kesan navdar dike. A niha jî em ê strana ku ji alîyê Arîf Mardîn ve hatîye bestekirin û Sevînç Tevs sitîriye, strana “Lounging For You” guhdarî bikin.

## STRANA 8’EM
## SEVINÇ TEVS - LONGING FOR YOU [3:48]

Wexta ku Tirkîye bi temamî dikeve tifaqa rojavayê, bi vî tiştî sermayeya rojavayê tîne Tirkiyeyê. Mînaka vê ya hêrî girîng; Otela Hîltonê ye ku di sala 1955an de li Stenbolê vebû. Piştî buyerên 6 û 7 ên meha Îlonê ya sala 1955an, xwedîyên mekanên şahîyên şevê, Rûm û Ermanîyan, Tirkîye terk dikin û li derdora Beyogluyê weka berê mekanên şahî namînin. Piştî vê serdemê hêlîna cazê êdî Otela Hîlton dibe û ev tişt jî dibe faktora sereke ya elîtbûna muzîka cazê.

Di sala 1959an de efsaneyê cazê yê Amerîkî Louis Armstrong tê Tirkiyeyê. Konserên Armstrongê, yek li Sînemaya Sarayê ya din jî li Otela Hîltonê tê lidarxistin. Konsera Armstrongî ku li Otela Hîltonê hat lidarxistin, wekî delîlek e pêşketina çanda cazê ye ku li Tirkiyeyê hê nûh bicîh dibû.
Wexta navê Louis Armstrong derbas bibe, divê em straneka wî ya cazê teqez guhdarî bikin.
Bernameya me bi strana hît a Armstrongê ya bi navê ‘What a Wonderful World’ê berdewam dike.

### STRANA 9'EM
## LOUIS ARMSTRONG - WHAT A WONDERFUL WORLD [2:17]

Di serdema duyemîn a salên 1950an de, pêşketina muzîka cazê û îfadekirina wê ya tarzeke cûda ya jiyanê, bandora xwe dide ser çanda popûler a vê serdemê jî. Di fîlmên sînemaya Tirkiyeyê ku di salên 1950an de hatine kişandin de li sahneyên dawet û baloyan, piranî muzîkên cazê û jêderkên wê tên tercîhkirin. Berdêla hemû sahneyên ku em êdî li sînemayê dibînin ew e ku; di serdema duyemîn a salên 1950an de muzîka cazê li Tirkiyeyê pêşveçû û li cîhên ku mirovên bijarte diçûn, muzîka cazê dihat îcrakirin.

Di fîlma 1956an a bi navê 'Kalbîmîn Şarkısı' ku derhênerê wî Lutfi Omer Akad bû û listîkvanê wî yê sereke Munir Ozkul bû de, sahneya ewilê ya ku di kulûbeka şevê de derbas dibû stranek lê dida. Em ê a niha rasterast wê stranê guhdarî bikin. Strana Put The Blame On Mame. Ji Anîta Ellisê guhdarî dikin. Kerem bikin.

### STRANA 10'EM
## ANITA ELLIS - PUT THE BLAME ON MAME [2:33]

Di salên 1960an de di çanda populerê de êdî cihê muzîka cazê mûzîkên nûh ên cûrbecûr digrin; wekî stranên aranjman ku gotinên wan bi Tirkî hatiye nivîsandin, stranên arabesk, pop, rock û hwd..
Li Tirkiyeyê bi mihricanên cazê re, dîsa cazz di sektora şahîyê de cîh digre. BÎLSAK ku rêxistineka civata sîvîl e, di mijara mihrîcanên cazê de gava pêşîn avêtiye û di sala 1985an de Mihricana Cazê ya Navneteweyî ya Bîlsakê lidardixe. Rêbaza ku Mihrîcana Cazê ya Bîlsakê da destpêkirin û 5 salan dewam kir, di sala 1991an de Mihrîcana Cazê ya Akbankê, di sala 1994an de jî Mihrîcana Cazê ya Stenbolê didomîne. Îro xeynî Stenbolê li bajarên îzmîr, Enqere û Afyonê jî mihrîcan tên lidarxistin. Heta li peravên Ege û Akdenîzê mihrîcanên cazê ku eleqe û hêjmara tevlîbûnê rojberoj zêde dibe, derdikevin holê.
A niha jî straneka koma herêmî ya cazê ku mêvanên Mihrîcana Cazê ya Bîlsaka ewilî bûn guhdarî bikin. Ji koma Nükhet/Neşet Ruacan, ku xuşk û bira ne, strana "Sentimental Journey" guhdarî dikin.

### STRANA 11'EM
## NÜKHET/NEŞET RUACAN - SENTIMENTAL JOURNEY [3:03]


Li Tirkiyeyê caz û dans dîsa bi saya Swîng Stenbolê li hev dicivin. Swing Stenbol, li Tirkiyeyê cara yekem studyoyên dansên swîngê ava dike û ji bo muzîka cazê ew serdem weke serdema zêrîn tê binavkirin. Yekem mihrîcana dansên swîngê ya navneteweyî ya Tirkiyeyê; Orient Lindy Express, ku damezrênerê wê dibistanek e, hezkiriyên caz û dansê û orkestrayên navdar ên îroyî, tîne gel hev. Li Tirkiyeyê wekî din li bajarên Wan, Bursa, Edene, Antalya, Bodrum û hwd li bajarên din jî dansên swîngê û muzika cazê bi sazîyên nûh re belav dibin.

Di sala 2017an de li Amedê jî dest bi atolyeyên swîng dansê tê kirin. Studyoya Dansê ya Swîng Amedê li Amedê dibe navenda xebatên muzîk û dansên cazê. Swîng Amed, li gel atolyeyan, bi mihrîcana dansê ya bi navê Amed Lindy Exchangeê û partîyan, ji bo ciwanên Amedê nêrîneka şahîyê ya nûh ava dike. Weke em dibînin Caz li Tirkiyeyê li gel navendên wekî Stenbol, li bajarên din jî xwe bicîh dike. Li sektora şahîyê jî cihê wê her ku diçe belav dibe û cihêreng dibe.
Belê, bernemeya me ya ku me behsa derketina cazê ya li Tirkiyeyê kir û bandora wê ya li hişmendîya şahîyê kir, we guhdarî kir. Em spasîya xwe pêşkeş dikin. Bi hêvî û dilşadî bimînin. Êvar baş.

# CAZA DÎPLOMATÎK

**5**

**AMADEKAR:** NISA YILDIZ-OMER GUZEL
**WERGER:** GUL MERVE EKINCI



Silav û rêz ji we hemûyan re. Em bi rezika bernameya Dem û Cazê bi hev re ne. Di vê beşa Caza Dîplomatîk de em ê muzîka cazê ya serdema Şerê Sar ê Dinyayê biaxivin. Ez pêşkeşvana we Gulê û amadekarên bernameyê Nîsa Yildiz û Omer Guzel in. Her wiha em spasîya xwe pêşkeşê Yagmur Gamze Olgun dikin ku di amadekariyên bernameyê de gelek keda wê derbas bûye. Pêncemîn bernameya Dem û Caz ku ji alîyê 'Qad Ji Bo Çand'ê ve piştgirî hate dayîn û ji alîyê Swîng Amedê ve hate amadekirin destpê dike.

Strana rêzê Cultural Exchange e. Ev stran li ser vê yekê ye ku di serdema Şerê Sar de Amerîka dixwaze ka çawa bê nasîn. Di vê stranê de piranî gotinên propagandayê cîh digre û balê dikşîne ser qehremantîya bêhempa ya Amerîkayê ku ji bo aşitiya dinyayê caz bikaranîye

## STRANA 1'EM

## THE REAL AMBASSADORS - CULTURAL EXCHANGE [4:42]

Albûma 'The Real Ambassadors' ku ev stran jî tê de ye, ecêb e ku muzîkjenên cazê yên reşik yên Afro-Amerîkî ku navdarên wê serdemê ne Dizzy Gillespie, Duke Ellington û Louis Armstrong jî tê de ne. Sedema vê tiştê jî ew e ku caz êdî li civakê tê pejirandin. Lê belê berê ji alîyê medya û civatê ve, caz bi narkotîk û sûcê ve dihat girêdan. De ka werin em a niha jî lê binêrin ku muzîka cazê li sîyaseta derve çawa wekî dengê Amerîkayê hatiye bikaranîn û hetta li hemberê Yekitîya Sovyetan çawa wekî çek hatiye bikaranîn.

Caz di eslê xwe de muzîka gelerî ya Afro-Amerikan e. Muzîka gelerî her çiqas wekî muzîka gundewarî were hesibandin jî ne wisa ye, muzîka bajarî ye. Caz li New Orleansê, bi hevbandorîya komên ji hev cûda derketîye holê. Muzîka Cazê, ji mirovên ku mafên wan hatine binpê kirin re, bûye rêyek ku, xwe baş îfade bikin.
Çanda vê muzîkê, piştî salên koletî û şerên navxweyî, di pêvajoya koçberiya ji gundan ber bi bajarê ve, di sedsala 20an de bûye têkoşîneke zindîbûnê.
Caz di koka xwe de cûreyên cûda di nav xwe de dihewîne. Yek ji wan jî 'stranên gelerî' ye. Ew stran, li cihên karên wekî rêhesinê ji bo ku qeweta karkeran zêde bibe wekî stranên motîvasyonê hatiye bikaranîn. Ew stran bi rîtmeke dîyar û bi karî re paralel dihat gotin. Stirîna tempoyek dîyar û domdar, motivasyon û hilberînê zêde dikir.
Her wekî din strana 'Field Holler' jî, ji bo stranên karî mînakek e, ji ber ku ev stran ji alîyê mirovên ku koletîyê dikirin ve, li zevîyên bêdawî dihat gotin.

Mirovên sipî di navbera salên 1917 û 1930ê de ferq kirine ku muzika cazê li civatê her ku diçe zêde dibe. Ji ber ku Caz êdî li weşanên radyoyan û li kulûban belav dibû. Û wisa xuya nedikir ku populerbûna wê ji holê rabe. Li gel wê jî li medya û civatên sipîparêz, li dijî cazê bertekên cihêkar û gumanbar jî gelek cîh digrin. Ji bo ku were fêmkirin mirov tenê manşetên nûçeyên wê serdemê binêre bes e. Manşetên wiha gelek dihat bikaranîn; mînak: 'Divê caza ku xofdariya wê nayê tarîfkirin tune bibe' 'Xwendekar, bi tundî li dijî Cazê disekinin' 'Cazê çawa em ji şaristanîyê dûr xistin' 'Pirsgirêka Cazê'.

Piştî Şerê Duyemîn ê Cihanê, şert û mercên dîrokî yên serdemê ji bo ku Caz bibe çeka çandî ya herî xurt a Amerîkayê, bingehek mezin amade kiriye.
Berî ku em bikevin rêwitîya Cazê, ka em hinek jî, ji Serdema Şerê Sar destpêkin û li encama guherîna dinyayê binêrin. Ev rastîyeke ku dinya êdi tu caran nabe wek a berê. Piştî Şerê Duyemîn ê Cîhanê, Amerîka ditirse ku li gelek welatan sosyalîzm belav bibe û pergalek sosyalîstî were avakirin. Serokwezîrê Îngilistanê Churchill di Adara 1946an de li bajarê Fultonê yê Amerîkayê li gel serokê Amerîkayê, Trumanê axaftina xwe ya navdar dike û li dijî Yekitîya Sovyetan şerê sîyasî îlan dike. Churchill bang li rêvebirên welatên Anglo-Sakson dike ku, li dijî sosyalîzmê yekîtiya hêzan pêk bînin. Ev axaftin di qada navneteweyî de ji bo bloka rojavayê planek çalakî bûye. Bi vî awayî pêşbazîyek çekdarî destpêkiriye û li derdora Sovyetan hêzên Amerîkayê blokên leşkerî ava kiriye. Bi vî awayî jî Serdema Şerê Sar destpêkiriye.

Şerê Sar ji xeynî sîyasetê, ji alîyê zanistî, teknolojî û tıpê jî gelek welatan anî rûyê hev. Di navbera du hêzên mezin ên Dinyaya nûh de, şerên çandî jî çêbûye. Navbera salên 1945 û 1953 ji bo Şerê Sar ê Çandî bûye, serdema avakirina nasnameyan. Her çiqas alîgiran, carinan bikevin gumanê ku bi kîjan argumanan tevbigerin jî, îlhamên xwe ji paşxaneya xwe ya dîrokî girtine. Di sala 1948an de jî di navbera du welatan de Smith-Mundt hatiye îmzekirin û Radyoya Dengê Amerîkayê(Voice Of America) hatiye damezrandin. Radyo bûyê rêya herî hêsan ku ji Sovyetan re propaganda bikin. Bi vê tiştê hatiye zanîn ku radyo, di propagandaya dîplomasîya çandî de rêya herî bibandor e. Li alîyê Yekitîya Sovyetan jî, di vî warî de yek ji çalakîyên herî girîng di sala 1948an de damezrandina Kominformê bû. Li komunîzma Yekitîya Sovyetan, îdealek heye ku hemû Sovyet di bin yek banî de bibin yek. ev îdeal li her qada sîyasetê xwe nîşan dida. Ji ber wê jî lêkolînên çandî yên Yekîtiya Soviyetê jî bi navgîniya Kominform ve hate kirin.

Amerîkayê li hemberê Yekitîya Sovyetan, di şerê çandî de caz wekî çekek bikaranîye. Gava pêşîn a politikaya wan jî ew bû ku muzikjenên Afro-Amerîkî wekî elçîyên çandî hilbijêrin. Di vî warî da armanca wan ew bû ku îmaja welêt, ku heta niha xerab bû baştir bike û propagandayê bikin.
Muzîka cazê, berevajî muzîka klasîk, balet û şanoyê, bi temamî formeke hunerî ya Amerîkayê bû. Gava ku serdestîya Ewropa û Sovyet, di muzîk û baleta klasîk de hate şikandin, mijara wekhevîya nijadî ji holê rabû. Ji xwe Amerîka di vî warî de gelek dihat rexnekirin.
Lê belê ev navgînîya propagandayê ku bi aqilmendî hatiye plankirin ne tenê fikra hikûmetê bû. Di heman demê de fikra parêzvanên mafên sivîl, muzikjenan û karsazên çandî bû ku muzikjenên cazê wekî elçîyên çandî werin hilbijartin. Wekî elçîyê cazê yê pêşîyê trompetvanê navdar John Birks Gillespie ku wekî Dîzzy dihat naskirin, hate hilbijartin. Ji du alîyên ve bi mane ye ku Dîzzy wekÎ elçîyê xêrxwazîyê hate hilbijartin. Ya yekemîn ev e ku Dîzzy ji xwe Afro-Amerîkî ye û di parastina mafên mirovan de ne bêdeng e, ya duyemîn jî berevajê Dîzzyê, Serokê serdemê Eisenhower di çanda sipîyên nîjadperest de mezin bûye û gelek jî li vê çanda xwe ya sipîparêz xwedî derketîye.

Di pêvajoya projeya elçîyên cazê de, Amerîka di mijarên wekhevîya nijadî û tevgerên azadî yên Afro-Amerîkîyan de bertekên ne xweş ji alîyên din girtîye. Ji ber vê yekê li sîyaseta derve dest bi başkirina îmaja welêt kirine.
Amerîkayê ji bo ku potansîyela propagandaya muzîkê zêde bike muzikjenên wekî Dîzzy Gillespie, Louis Armstrong, Duke Ellington tevlî gerên xwe yên gelek girîng kiriye. Ev pêngav ji bo wan bûye kelehek ku li hemberê rexneyên nijadperestî, wan biparêzin. Polîtîkayên wan ewqas girîng bûye ku, ji bo polîtîkayên çandî butçeyên taybet amade kirin. Li alîyê din jî kesên ku ji gerên ewropî hezdikirin, eleqaya wan gelek alîkar bûye ku caz li her çar alîyê cîhanê belav bibe da ku şêwaza jiyana Amerîkayê empoze bibe.
Piştî şerên yekemîn û duyemîn ên Dinyayê, leşkerên Afro-Amerîkî yên ku li Ewropayê mane, bûne yekem temaşevanên navnetewî yên cazê. Gelek dilxwazên leşker piştî şerê jî tercîh kirine ku li Fransayê bimînin. Ev civat li Parîsê li herêma Right Bankê dijîyann û li gorî welatên xwe ji nijadperestîyê dûr bûn. Wexta ku Wezareta Karên Derveyî ya Amerîkayê gerên Ewropî daye destpêkirin, lîderên komê ferq kiribûn ku temaşevan û guhdarvanên derveyî welêt, bêhtir qiymeta muzîka cazê zanin.

Belê a niha jî em ê straneke elçîyê yekem ê Cazê ku bi trompêta xwe tiştên gelek delal kirine, guhdarî bikin. Ev Dîzzy e. Em ê strana wî ya Bîrk's Works ku di albûma The Champ de cîh digre guhdar bikin. Ev albûm di sala 1956an de derketiye.

## STRANA 2'YEM

## THE CHAMP - BIRK'S WORKS [3:09]

Gerên Cazê ku bêplan destpêkir, ji muzikjenan re bû derfetek ku berdêla çandî bikin û di mijara demokrasîyê de fikrên xwe bi hev re parve bikin. Lê belê bi taybetî jî di gerên pêşîyê de, ev azadiya wan bû sedema wê tiştê ku, muhafazakarên Amerîkayê ew ji xwe re kirin hedef û bi rewşên serobin re rû bi rû man.
Bi sedema ku nijadperestî her ku diçû zêde dibû û her du alî jî ji bo serdestîyê berê xwe didan, qeyran derket. Ji ber wê yekê jî di sala 1956an da Dîzzy şandin Rojhilata Navîn, di sala 1957an de Benny Goodman şandin Başûrê Asyayê, di sala 1958an de Dave Brubeck şandin Polonyayê. Yanî ew ji nişka ve şandin herêmên germ ên serdema şerê sar ku li wan deveran ji xwe qeyranên global hebûn.

Wexta ku gerên Cazê destpêkiribû CIA ji xwe li Rojhilata Navîn, li Başûrê Asyayê û li Amerîkaya Latîn dest bi xebatên xwe kiribû. Di bingeha meşrukirina wan de ev tişt hebû; Sovyet dijminên zirardar in ji ber ku şêwaza jiyana Amerîkayê tehdît dikin. Ya rastî wexta ku sîyasetmedaran vê tehdîdê wekî hedef nîşan didan, komûnîzm û neteweperestî tevlîhev dikirin. Li gorî ramana wan a etnosantrik, rêberên ne-rojavayî nikarin bi serbestî bifikirin û biryarên xwe bidin. Hewldanên daxistina rêberên li Rojhilata Navîn, Afrîka, Asya û Amerîkaya Latînê jî ji wir tê. Ew wisa didîtin ku kesên ne ji rojavayê ne maşikên Sovyetan e.
Weke mînakek ji daxuyanîyên elçîyên cazê ku wê serdemê tarîf dikin em karin gotina Phil Woods ku hunermendê Alto Saksafonê ye bidin. Wî gotibû 'wexta em ji Amerîkayê hatin Îranê bêhna petrola xav dihat û dengê tifingan ku ji Iraqê dihat me seh dikir'.
Buyerên ku diqewimîn, her çiqas gumanê zêde bike jî cihê pêşandana cazê bêhemdî nehatibû hilbijartin. Heke mirov li gera ku Dizzy tevlî bûye binêre baş tê dîtin; Amerîkayê armanc kiriye ku bibe xwediyê petrolên herêmê. Ew petrolên herêmê, berê yên Îngilîstanê bûn. Li Îranê ku dilê petrol û împaratoriya Brîtanyaya kevn bû, berê 3 salan bi piştevaniya CIAyê darbe çêbibû. Di encama wan buyeran de Amerîka cara pêşîyê ketiye qada petrola Îranê û di wan salan de jî hunermendên xwe bêyî tirs û xofdarîyê şandiye Îranê. Orkestraya The Dave Brubeck Quartet û Duke Ellingtonê xwe di nav darbeyên ku di salên 1958 û 1963an de qewimî dîtine.

Dixwazin em hinekê jî li naveroka gerên konseran binêrin. Li gorî plana giştî; di heftekî de 3 konser dihate dayîn û wekî din jî bi rêya UNICEF û sazîyên herêmê ji bo berjewendiya zarokan konser dihate dayîn. Muzikjenan bi saya wê, derfeta naskirina hunermendên herêmê jî didîtin. Hunermendê saksafona tenor Billy Mitchell û hunermendê trombonê Rod Leavitt, li Enqereya Tirkiyeyê hunermendê herî navdar ê trompetê Muvaffak Falay naskirine û li Intıme Casinoyê bi hev re konserek dane. Dîzzy ji bo ku biratîya cazê temsîl bike qutîyeka cixareyê ya neqişkirî dîyarîya Falay kiriye.

Caz li hundirê Amerîkayê û li derveyî Amerîkayê ji hev cuda dihat fêmkirin. Gotinên Dizyyê ji bo vê rewşê weke mînakek e. Wî hevpeyvîna xwe ya meha Hezîrana 1957an ku dabû kovara Esquireyê gotibû: Caz ji bo Amerîkîyan zêde zêde baş bû. Caza ku wî herdem lê dida, li welatê wî wekî şaxê hunerê nedihat dîtin û wî jî ji vî yekî gelek sîtem dikir. Medya û welatîyên Amerîkayê yên wê serdemê hê jî, caz wekî çanda jêrîn didîtin. Dîzzy gotiye ku 'Ew mirovên hêyî, dibêjin qey caz bi mêjiyê ve na bi lingê ve tê guhdarîkirin'  Li Amerîkayê caz wekî muzîka zarokan û muzîka narkotîkan dihat dîtin.

Dîzzy, Goodman û Brubeck li gerên xwe li gel kaosan, li gel nakokîyên sîyasî yên neteweyî û navneteweyî jî karên xwe yên elçîtîyê zêde xweş bicîh anîne. Wan, Karmendên wezaretê, rojnameger û temaşevan, mest kiribû. Li gorî karmendên Wezareta Karên Derveyî, muzîkjenên cazê bi tevgerên xwe yên afirîner, xemsar û bi gotinên xwe yên wekhevî, hemû propagandayên qure yên Amerîkayê bipaş xistîne. Wexta ku ji alîyê muzikjenan ve bihata mêzekirin, dihat dîtin ku ew hemû sermayeyên xwe yên çandî derxistine meydanê û di parêzvanîya maf û cazê de çiqas bibiryar in.

Belê, em ê a niha jî ji albûma The Real Ambassadorê straneka rexnegir guhdarî dikin. Rexneyên wê li ser ol û nijadperestîya Afro-Amerîkîyan e.Strana ku solîstê wî Louis Armstrong û vokalîstên wî Dave Lambert û John Hendrick in strana They Say I Look God e. Solîst û vokalîstên stranê, navderên elçîyên cazê yên wê serdemê bûn.

## STRANA 3'YEM
## THE REAL AMBASSADORS - THEY SAY I LOOK LIKE GOD  [5:25]

Amerîkayê, dev ji stûna komunizmê yanî ji Ewropayê berda û berê xwe da Sovyetan. Benddy Goodman muzikjenê cazê yê pêşîyê bû ku di navbera Qeyrana Berlîn û Qeyrana Fûzeyî ya Kubayê de, çû welatê Sovyetan. Wî di 6 bajarê Sovyetan de 30 pêşandan kir. Gerên Goodmanê rastî demên bêbext hatin. Ji ber ku di wê wextê de Kennedy serok bû û armanca wî ew bû ku dijîtîya şerê sar derxîne astek jortir. Yekitîya Sovyetan jî di wê wextê de dîyar kir ku ew dixwazin weşanên Dengê Amerîkayê ji holê rakin û zêdetir piştgirî bidin weşanên neteweyî yên xwe. Danûstandina çandî ku wê çêbûba, ji ber gumanên beramberî û propagandayên agresîf hate birîn. Peywirdarên fermî yên Sovyetan biguman nêzîkê Caza  'Rojavayê ya bêesil' dibûn. Cazê, hem ji bo Goodman û ekîba wî hem jî ji bo guhdarvanên Sovyet, temsîlîyeta derfeta azadî û xwe îfadekirinê dikir. Goodman elçîyek wisa bû ku di dema gerên Asyayê yên 1956 û 1957an de xwe îspat kiribû lê belê dîsa jî fikra şandina wî ya Sovyetan pêşîyê pir nehat pejirandin. Sedema vê yekê jî ew bû ku; Amerîka ji ber wekhevîya nijadî pir dihat rexnekirin û ji xwe re mertalek bi bijartina elçîyên Afro-Amerîkî peyda kiribû. tirsa wê ew bû ku bi çûyîna Goodmanê ya Yekitîya Sovyetan, ixtîmal heye ku vê mertalê zirarê bibîne.

Li gorî anketên nefermî yên Amerîkayê; hate dîtin ku gelê Sovyetan, pir ji weşanên propagandayê yên Radio Free Europeyê ku ya dewletê ye heznedikir lê belê Voice Of America-Dengê Amerîkayê ku navgînîyeke propagandaya çandî ye, jê zêdetir dihat hezkirin.  Popûlerbûna muzîka Cazê ya li Yekitîya Sovyetan, li gorî zext û polîtîkayên azadî yên wê serdemê dihat guherandin û bi giştî jî derbejêr û derbejor dibû. Di salên 1920an de muzika cazê bi firehî hatiye qebûlkirin û di salên 1930an de jî tam beravajê wê çêbûye. Di salên bêhnfirehî yên Şerê Duyemîn ê Cîhanê de jî dîsa zîndî bûye. lê belê di dawîya salên ku Stalîn serok bû de bertekên tund re rû bi rû mane. muzikjenên cazê hatine girtin û di kampên komkirinê de êsir mane. Her çiqas li hember neheqiyên ku Afro-Amerîkîyan dîtine bi empatî nêzîk dibûn jî fikra ku caz 'tacîzkirina çandî ya Yankeeyan' e di wan de rûniştibû. Di bingeha redkirina cazê ya Sovyetan de gelek sedem hebûn. Ji alîyê Sovyetan ve balet û muzîka klasîk hatibû pejirandin. peywirdarên Sovyetê jî dixwestin ku di nav hunerê de hîyerarşîyek tûnd hebe. Hew formên klasîk wekî huner dihat binavkirin û yên din ne tenê yên jêrîn, di heman demê de wekî bêesil û pûçbûyî dihate dîtin. Dijberên Cazê wisa digotin ku caz temsîlîyeta zayendîtî, hevzayendî û bêesilbûyînê dike. Wekî din jî wexta ku li Fuara Moskowê caz hate qedexekirin, wekî dilopa enîyê, ji wan re bû sedem ku lê bipirsin ka têkîlîya Wezareta Karên Derveyî yên Amerîkayê bi Cazê çi bû. Li gel hemû tiştan jî li Yekitîya Sovyetan hem ramana nûjen hem jî ramana dij-nûjen her dem hebûn.

Hetta li gorî Willis Conoverê caz di navbera wan de wekî mifteyek bû û ew mifte her ku dem derbas dibû vediguherî çekek veşartî. Di heman demê de rejîmên totalîter bi rihetî li ber çavê xwe wê mıfteyê didîtin lê nikarîbûn pêşîya wan bigrin.

A niha jî em ê strana Sovyetê ku aîdê sala 1968an e guhdarî bikin. Navê stranê Dedushkina Svirel e û ya Balalaika Jazz Ensembleê ye,

## STRANA 4'EM

## BALALAIKA JAZZ ENSEMBLE - DEDUSHKINA SVIREL [8:45]

Piştî serdema pevçûnên pêşî yên Şerê Sar, gerên cazê êdî weka berê bi dilxazî û popûlerbûnê nehate damezrandin. Domdariya bernameyên rodyoyê yên dihatin weşandin jî nîvco kirin û ji bo cazê weka berê jî butçe nehate dîtin. Ji bo ku piştî vê serdemê baş were fêmkirin divê serdema ku projeyên elçîyên çandî tê de hebûn bi kurtasî were qalkirin. Di vê serdemê de gelek guherandin di heman demê de çêbûne.
Wexta ku pirsgirêka wekheviya nijadî di navenda siyaseta derve ya Amerîkayê de rûnişt, 40 welatên cûda yên Afrîka û Asyayê serxwebûna xwe bi dest xistin û îlan kirin. Amerîkayê li gel hemû tiştên ku dihate jiyîn jî, li dinyayê bazarîya muzîka cazê wekî temsîlîyeta wekhevîyê dikir. Caz ewqas belav bûbû ku radyoya Dengê Amerîkayê li gelek welatan dest bi weşanê kiribû. Heta li hin girtîgehên taybet jî hatibû guhdarîkirin.

Cazê, hêrî kêm 20 salan temsîlîyata nûjenbûyîn û mafên Afro-Amerîkîyan kiriye. Lê belê sedema wê ne ew e ku elçîyên cazê gotibûn 'Em li welatekî azad dijîn' tam berevajê wê, gotinên wan ên ku gotibûn 'Em ji bo wekhevîyê berê xwe didin û em dikarin bi têkoşîna azadîyên din ên cihanê re empatî bikin.' bû. Bi vê yêkê tê dîtin ku muzikjenên cazê bi tenê wekî maşikê nehatine bikaranîn. Ew hem çanda xwe ji yên din re vegotine hem jî di bandora çandên din de mane û nêrînên xwe yên jiyanê berfirehtir kirine. Carnan jî rayedarên hikûmetê ji wê yekê aciz bûne û gotine 'Hûn ji ber çi axaftinên wisa dikin, hûn armanca me ya sereke xerab dikin'. Prestîja cazê ya li polîtîkaya derve pir nema û sedema wê ya sereke jî guhertina polîtîkaya derve ya Amerîkayê bû. Amerîkayê wexta ku hewl dida serdestiya cîhanê bigre destê xwe, dixwest ku xwe aşitîyane nîşan bide. Îmaja ku li hember gelê xwe dabû rûnişkandin, bi çalakîyên xwe yên heqîqî xerab kir. Mesela, elçîyên cazê tam vî karî dikirin. Lê belê piştî Şerê Vîetnamê daxwazîya wê ya ku dîsa hêza xwe îspat bike, di bin Serok Ronald Reagen de bi Yekitîya Sovyetê re bû sedema alozîyek.

Lêbelê, Amerîka, ji nîgara xwe ya aştîxwaz dûr ket û bi pêngavên xwe destnîşan kir ku wê tu caran venegere ser rêya xwe ya kevn a siyasî. Ew pêngav jî ew bû ku di sala 1983an de welatê Karayîba reş a Grenadayê dagir kir û di dinyaya kêm pêşketî de politikayên lihevanîna pêkhatî ya IMF-Bankaya Cîhanî empoze kir. Êdî her çiqas elçîyên cazê bi tena serê xwe dengê berxwedan û azadîyê bibin jî, ji ber ku îmaja Amerîkayê temsîl nedikirin tu manaya elçîbûnê jî nemabû. Piştî guherandinên wisa, empozekirina yan jî îxrackirina çandî hê jî neqedîyaye. Lê belê form û kalîteya wê guherîye. Wexta em li îro jî binêrin tê dîtin ku çanda Amerîkayê, li derve ji alîyê sazîyên wekî McDonalds, Baywatch, Nike, Microsoft û Britney Spears ve tê temsîlkirin. Hema hema ne mimkun e ku, mirov, wan bi bandora Duke Ellington an Louis Armstrong re bide ber hev. Ji ber ku li alîyekî elçî hene ku, di serî de, bi kesayetî û nêrîna xwe ya cîhanê mirov in, li alîyê din jî, di destpêka sedsala 21emîn de sazî û navdarên ku, ji bo sûkê hatine hilberandin hene.

Em ê a niha jî covera strana ku Melinda Doolittleê stirîye guhdarî bikin. Ev stran; caza ku ji hêla Amerîkayê ve weke amûrekî propagandayê dihat bikaranîn û strana ku amûra propagandayê ya îroyî ye tîne gel hev. Navê stranê; Toxic e û ya Britney Spears e. Kerem bikin.

### STRANA 5'EM

## SCOTT BRADLEE'S POST MODERN JUKEBOX FEAT. MELINDA DOOLITTLE – TOXIC [4:45]

Her çiqas Caz wekî sembolekî çand û aşitiya Amerîkayê neyê bikaranîn jî, li seranserê cîhanê, ji ber encama zêdebûna globalbûnê hebûna xwe didomîne. Her çend ew teybetmendiya koka xwe wenda nekiribe jî, bi çandên ku pê re têkilî danîye re guherîye û berdewamiya xwe misoger kiriye. Ji xwe ne wisa ba li RadyoAmedê wê ew bername nehatiba pêşkeşkirin.
Û em bi vî awayî hatin dawîya bernameya xwe. Ji bo guhdarkirina we gelek spas dikim. Bi hêvî û dilşadî bimînin. Êvar baş!

# FERASETA ŞAHÎ Û ABORIYÊ YA CAZÊ

**6**

**AMADEKAR:** EMRE UGURLU
**WERGER:** HIŞYAR AYDIN



Merheba ji her kesî re, em niha bi rêze bernameyên radyoyê yên Dem û Cazê li gel we ne. Di vê bernameya bi navê Feraseta Şahî û Aboriyê ya Cazê de ez pêşkêşvana we Gulê û yê ku naveroka vê bernameyê dagirtiye jî Emre Ugurlu ye. Şeşemîn bernameya "Dem û Caz"ê ku ji hêla Swing Amedê tê amadekirin û pişgiriyê ji "Qad Ji bo Çand"ê distîne dest pê dike.

## STRANA 1'EM

### TARA MAMEDOVA – ÇUKO REBENO [2:58]

Bernameya me ya ku em dixwazin bi kurmancî veguhêzin, muzîka cazê ku bandor li gelek zimanan kiriye, li erdnîgariyeke fireh belav bûye û xwediyê zimanekî navneteweyî ye li ser vê axê qiymeta ku heq dike, nedîtiye. Ev yek jî ji me re bûye sedema motîvasyonê. Ku hûn bêjin erê em ê bi strana xwe ya duyem re rêwîtiya xwe bidomînin.

## STRANA 2'YEM

### OSCAR PETERSON TRIO - D&E [5:21]

Caza ku çîroka wê ji serdemekê bêhtir e û hew qasî melez e; nikare bi erdnîgariyekê bê sînorkirin, ev tiştek ne rast e. Heke merev bibêje cihê ku lê çêbûye Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û cihê ku hatiye rexnekirin jî Ewropa ye, tespîteke di cî de ye. Yekem pesindayîna ku hêjayî qalkirinê ye di 1919'an de ji hêla şefê orkestrayê Ernest Ansermetê swîsreyî ve hat nivîsandin. Yekem pirtûka cazê ji hêla Robert Goffinê Belçîkî ve di sala 1929'an de hat nivîsandin. Yekem kovara cazê di dawiya salên 30'î de Charles Delaunayê frensî amade kir. Di wê demê de caz ji hêla entellektuel û hunermendê ewropî ve weke hunereke ciddî dihat qebûlkirin. Ji Hindemithî ta Stravinski, ji Picassoyî ta Matiseseyî hunermendên ewropayî yên mezin bi cazê re têkildar bûn, li ser wê xebitîn û di berhemên xwe de ji bo wê li çepikan dan. Li beranberî vê rewşê, caz li cihê ku lê çêbû demeke dirêj weke muzîkên sîrkan hate dîtin.

Tevî ku kovara Downbeatê ya kokên xwe dispêre Amerîkayê, di cihanê de weke kovara herî mezin tê qebûlkirin, Kovara Swing Journalê ya ku di 1947'an de li Tokyoyê weşana xwe ya yekem bi japonî kir, bi qasî wê bi nav û deng e. Di tevahiya cihanê de kovareke ku xwedî tîraja herî zêde be, vêya nirxê kovarê derdixîne holê. Kovareke dinê ya xwedî prestîj e ya bi navê Jazz Forumê ku kokên xwe dispêre Ewropayê û navenda wê Varşova ye, 1967'an de di bin banê rejîmeke komunîst de dest bi weşanê dike, di hejmara yekem de bi tenê bi lehî dest bi weşanê kiriye û paşê bi îngilîzî û elmanî jî weşiyaye û li 103 welatan belav bûye. Hûn dixwazin vêya weke stratejiyeke belavbûnê ya çandê ya Amerîkayê bibînin, hûn dixwazin jî weke encama navnetewebûyîna zimanê muzîkê bibînin. Di her hilbijêriyê de caz bi gelek cureyên xwe muzîka populer ya dema me xwedî dike. Ji muzîkên fîlmên polîsiye yên TV'yan bigirin ta muzîkên asansoran, di lobiyên otelan de, di reklamên radyoyan de yan jî ji muzîkeke dansê ta rock, funk û hip-hopê, dema em dans dikin di muzîkên rojane ku merev dikişînin nav xwe de soundên ku hene cazê tên. Di muzîka rojavayî de lêdan(beat) jî ji cazê hatiye.

Heger em bipirsin bê tişta herî bibandor a di nav muzîka cazê de çi ye, bersiv dê bibe "peresana nav stîlan". Ev peresan di nava hevgirî, mentiq, bivênevêyî û bitûniyê de pêk hatiye; weke ku tê zanîn, jixwe di hemû hunerên rasteqîn de peresaneke bitûnî tê dîtin. Her kî yek ji pêkhateyên vê peresanê tune bihesbîne û wê tena serê xwe derbasdar an jî weke pêngaveke çewt bihesibîne, tevahiya wê serobino dike. Bi vî awayî jî yekîtiya peresanê ji hev dixe; lê belê bêyî vê yekîtiyê merev kare qala modayê bike, lê merev qet nikare qala stîlê bike.

Ev rastiyek e ku New Orleand di zayîna cazê de yek ji wan bajarên herî girîng e, lê dema ku em bibêjin caz bi tenê li bajarî zaye, ev xeletiyeke mezin e. New Orleans bi navê xwe yê kevin La-nouville Orleans, navê xwe ji duktiyeke girîng ji Fransayê distîne. Ji xwe wîlayeta Louisianayê ku wê di xwe de dihebîne, ji hêla emerîkiyan ve di 1803'yan de bi 8 mîlyon frenkî ji frensiyan hatiye kirîn. Di roja îroyên de ev reqem, reqemeke komîk e. Ev pere dike 720 mîlyon tl. Koleyên ku ji rojavayê Efrîkayê, bi piranî ji Kongoyê, ji ber perên Çemê Kongoyê hatine, qadeke bi navê Qada Kongoyê diafirînin, ku ev qad di demên herî dijwar ên koletiyê de ji wan re bûye stargeha azadiyê. Mirovên ku bûne kole, di rojên yekşeman de li vê qadê diciviyan, karibûn dans bikirana, stran bigotana û stranên xwe vejenandana. Hetta karibûn azadiya xwe bisitendana an jî bi awayeke tîcarî karibûn mal bisitendana û bifirotana. Heta nava 1880'yan reşikan, ji bo adetên voodooyî bidin jiyandin, bi awayeke rêk û pêk diciviyan û ayînên ku rihên xwe dispêrin kevneşopiyên efrîkî li dar dixistin. Stranên ku ji bo xwedayê nû û Îsa digotin, ji wan stranên ku ji bo ruhên baş û nebaş digotin ne cuda bûn. Qada Kongoyê di nav sînorê wê parkê de dimîne ku îro peykerê 12 metreyî yê rebbê cazê Louis Armstrongî tê de ye. Piştî qedandina Şerê Navxweyî yê Amerîkayê ku bi Şoreşa Senayiyê re gur bûbû, qaşo jiholêrabûna koletiyê bi xwe re hin pirsgrêkan tîne. Azadî bi xwe re pirsgrêkeke mezin a kar û bêderfetiyên maddî derdixe holê. Ev jî dibe sedem ku koçên mezin çêbibin, ber bi cihên ku derfetên kar lê hene. Ev jî encameke wiha derdixe holê, muzîk li cihên cuda bi çandên cuda re tev li hev dibe. Sedemeke dinê ya pêşketina muzîkê jî firotina amûrên muzîkê yên destê duyem ji hêla artêşê ye. Ev herdu bûyerên gira gira, dest bi avêtinê asasê cureyeke nû yê muzîkê dikin. Li cihên ku diçinê, muzîkên ewropayî bi muzîkên xwe yên herêmî re diguherin, bi rîtmên xwe, beatên xwe gêre dikin.

Bi gelek cureyê cazê ji New Orleansê ta roja îro rûbarek diherike. Heta bi şoreşên di nava serdema cazê de ne jî dema merev li rabirduyê dinihêre ji veqetînê diguherin, dibin pêvajonî bivênevêyî. Herikîn carna ji sûlavan derbas dibe, kûrahiya wê kêm dibe yan jî şidatir dibe; lê belê her diherike û weke heman rûbarê dimîne. Tu stîl nikare têkeve şûna stîleke dinê. Her stîl, yeka berî xwe û hemû yên berî xwe di hundirê xwe de dihebîne.
Gelek muzîkjenên cazê bi şik nêzîkî vejandina stîlên cazê yên berê bûne. Ya ku muzîka cazê li ser lingan dihêle zindîbûna wê ye, jiyîna wê ye. Ya ku dijî, diguhere. Dema ku muzîka William James " Count" Basieyê ku kontê cazê ye, di salên 50'yî de di dinyê de deng veda, ji Lester Youngê ku efsaneyekî dinê ye hat xwestin ku bi muzîkjenê orkestraya xwe ya berê re stîla salên 30'î di albumeke xwe de ji nû ve vejîne. Lester got: "Ez nikarim". "Ez êdî wisa lênadim. Bi awayekî dinê lêdidim; bi awayekî dinê dijîm. Niha, dem demeke dinê ye; lê ew dem, ew dem bû. Em diguherin, tevdigerin." Bi awayekî hêsan tê famkirin ku, ev tiştên ku hatine gotin îro jî ji bo jinûveavakirina stîlên cazê jî derbasdar in.

Vebizavên şoreşa senayîyê û Şerê Navxweyî yê Amerîkayê di 1890'î xwe bêtir dan nîşandan. Destpêka ya nuh, ev dem, demên avakirina civaka xerîdariyê ne. Yanî civak neçar dimîne ku xwe biguherîne. Ragtimeya ku em karin bibêjin yekem stîla cazê ye jî di van deman de ava bûye. Ragtime stîleke wiha ye ku, li gorî wê; rîtim ji melodiyê girîngtir e, ji jixweberêbûnê ku pêkhateyeke girîng ya cazê ye, bêpar e, amûra serleheng jî pîyano ye. Ger bi dilê we be; niha jî em ê Scott Joplinî – li strana Maple Leaf Ragê guhdarî bikin ku weke pêşengê vê stîlê tê qebûlkirin.

## STRANA 3'YEM

## SCOTT JOPLIN – MAPLE LEAF RAG [2:45]

Bihgehana navdarbûna Scott Joplin û ragtimeyê pêşengeheke navneteweyî ya bi navê World's Columbian Exposition e. Fûara ku ji bo 400'emîn salvegera Kristof Kolombî hatibû lidarxistin, li ser 690 donimî, 6 mehan, ji bo 27 mîlyon însanî mazûbantî dikir.
Ragtime bi taybetî li bin konê karkerên ku li seranserî kîşwera Amerîkayê rêyên trênê saz dikirin hat hezkirin. Li her derê lê hat guhdarîkirin. Li Seadliayê û Kansas Cityê, li Texasa ku St. Louis û Joplin lê hatine dinê. Bestekarên rastimeyê "rag"ên xwe di silîndirên piyanoyên mekanîk de tomar kirin û ji van silîndiran bi hezaran derxistin piyasê. Ji bo ku hîn aleteke tomarkirinê çênebûbû pergala piyanoya mekanîk ya ku van ruloyên kaxizan yên biqul karibû bixwendana, aleteke girîng bû. Ev tomarkirinên ku em li wan guhdarî dikin, paşê di salên 1950'yî de bi awayeke jixweber hatine dîtin û li ser plakan hatine tomarkirin û heta îro jî hatine.
Vodvilên ku em zanin li Frensayê derketine holê û teşe dane şahiyên wê demê, bi nav û deng bûne. Di nava vodvillan de gelek stîlên şahiyan cihê xwe girtine, weke muzîkjen, stranbêj, dansker, sihêrbaz, komedyen û şanoyên yekperdeyî. Piştî şer, di wê serdemê de nijadperestiyê xwe xurttir dikir û dihat. Ku Klux Klan di van deman de derket, vodvila Jim Crowê dijminê reşikan ku dê di dema pêş de li ser navê wî li Amerîkayê qanûn jî bihata derxistin, jî di vê demê de derket. Biçûkxistin ji navê wî jî xuya ye ku "crow" di îngilîzî de tê wateya qijakê. Jim Crow lîstikeke şanoyê ye ku nijada koleyekî reşik biçûk dixe, bi awayekî qeşmerî, nêrînên yên spî yên li dijî reşikan nîşan dide. Weke ku tê dîtin " Qanûnên Jim Crowî" ku weke rûreşiyekê di dîroka Amerîkayê de hatiye nivîsandin, navê xwe ji vê lîstikê girtiye.

Di serî de ev qanûn li eyaletên başûrê Amerîkayê, piştî şerê navxweyî, ji bo ku reşik mafên polîtîk û aborî bi dest nexin derketiye holê. Di serî de di 1875'an de xwe li Tenesseeyê daye qebûlkirin. Di serî de di riyên trênan de, paşê li otel, şano, pirtûkxane, asansor û dibistanan, li kêleka tabelaya "bi tenê ji bo spiyan", tabelaya "ji bo reşikan" jî hate zêdekirin. Hetanî salên 1960'î, şoreşa Martin Luther King jî domiyaye ev qanûn.
Helbet Jim Crow ji bo muzîkjenên reş jî dîwarekî mezin lêdikir. Ya ku nehişt muzîkjenên reş berê xwe nedin muzîkên ewropî, muzîka klasîk jî dîsa ev nijadperestî ye. Lukseke weke çûna konservatûwara muzîkê ji bo yekî reş zor bû, ji ber ku di karên herî erzan de ew dihatin xebitandin. Karên baştir ji zû ve ji hêla Jim Crow ve hatibûn desteserkirin. Jim Crow, muzîkên operayan, radyoyan, Hollywoodê û senfoniyan ji zû ve bi dest xistiye. Ji ber vê yekê ji bo yên ku dibêjin cudahiya nijadan û pêşbîniyan ji ber "perwerdehiyê" pêk tên em karin vê bibêjin, her ku reşik di pêlikên serkeftinê de bi jor ve diçûn, cudakeriya nijadî bêhtir pêrgî wan dihat, belkî ev meseleyê hinekî zelaltir bike. Ji aliyê nasîna qabîliyet û zîrektiyên xwe, yekî reşik gelekî gelekî ji orkestrayên senfoniyan û bandên cazê bi şûn de ne.

Heke em vegerin New Orleansê, New Orleans nava sedsalê de bûbû çetilxêra gel û nijadan. Frensî û spanyolî, paşê îngilîz û îtalî, hetta ji bilî elmanî û slavîyan, li herêmê bêhejmar neviyên koleyên zencî yên ku ji Efrîkayê hatibûn bi hev re bûn. Cudahiyên çandî û neteweyî yên di navbera reşikan de, ne kêmî yên spiyên ku ji Îngilîstan û Spanyayê hatibûn bûn. Koçberên mecbûrî û yên bidil ên vî welatî, herî pir dixwestin muzîkên xwe û tingîniyên welatên xwe zindî bihêlin. Stranên gel ên îngilîzî dihatin gotin, dansên spanî dihatin kirin, muzîka bale û ya gelî ya fernsiyan dihat lêdan. Li ber muzîkên marşî yên bandoyên leşkerî dimeşiyan; wê demê bi piranî li cihanê di bandoyan de terza Prusya mînak digirtin. Qêrînên reşikan ên weke stranan, dansên wan û rîtimên wan tevî wan tingîniyan dibûn. Hezkirina bo muzîkê hew qasî zêde bû ku li van bajarên ku derdora du sed hebî bûn ku li dora Delya Mississippiyê bûn, 30 heb orkestira hebûn ku, bi awayekî zindî muzîk dikirin, xwe bi pêş ve dibirin û muzîkên jixweberî pêk tanîn! Me berê jî gotibû, ew gotina ku dibêjin bajarê ku caz lê çêbûye ye, ne rast e. Lê em karin bibêjin ku ev der, cihê ku caz lê bilûr bûye ye. Muzîka reşikên li cihên gundewarî, worksongsên ku dema xebatê de tên gotin, spirîtualên ku di ayînan de belav dibûn, stranên blues ên kevn î "hoveber"... Vana hemû di forma zayînê ya cazê de hatin gel hev.
Çend faktor hene ku girîngbûneke wiha taybet dide New Orleansê. Jixwe heta salên 30'î ji sedî 60'ê hemû muzîkjenên cazê ji vî bajarî derketine. Yek ji vana jî guncavbûna vî bajarê di nav tevlîheviya nijadî de ji bo danûsitendina çandî. Ya duduyan jî rageşiyên di navbera herdu gelên reşik yên ji hevdu gelekî cuda û zindîtî jî xwedî bandorekê ye. Vana reşikên "Kreol" û "Amerîkî" ne. Şik tune ye ku di eslê xwe de reşikên "Kreol" bi qasî yên dinê, hetta hinekî ji wan bêhtir "Amerîkî" ne; ji ber ku Kreollên Louisianayê ji çanda tevlihev ya serdema mêtingehî ya frensî dihatin. Wekî reşikên dinê, ne neviyên wan koleyên ku piştî Şerê Navxweyî yê Amerîkayê azad bûne bûn. Bav û kalên wan gelekî bertir azad bûbûn. Gelek ji wan, ji hêla berhemdarên frensî yên zengîn û tuccarên mezin ve hatibûn azadkirin. Van reşikên Kreolî çanda frensiyan pejirandibûn. Zimanê wan ne îngilîzî bû, "Kreolî" bû; yanî frensiyeke xirakirî. Navên frensî bi kar dianîn. Efsaneyên weke Sidney Bechet, Kid Ory, Jelly Roll Morton kreol bûn. Li beramberî vê yekê reşikên "Amerîkayî" bêhtir "Afrîkayî" ne. Reşikên proleter yên xizan û bêwar yên New Orleansê ne. Reşikên kreolî bi hişmediyeke civakî û çînî ya li gorî xwe, li reşikên Amerîkî dinêrîn. Li gorî gîtarîst Jonny St. Cyr wê demê yên Kreollî " ji hemû însanên spî bêhtir bi pêşbînî li reşikan dinêrîn."

Ji ber vê yekê di nava muzîkjenên New Orleansê de du komên bi temamî ji hev cuda hene û ev li bandorê li muzîka wan dike: Komên Kreolî bêhtir pispor û xwedî perwerde ne. Yên ku Amerîkî ne jî bêhtir ji dil û zindî lêdidin. Lê piştî demeke kurt, muzîkjenên ku bi rastî hoste ne, pêkhateyên herdu kevneşopiyan dikin yek. Ê ku vêya herî baş dike jî, Jelly Roll Mortonê piyanîst, bestekar û şefê orkestirayê bû. Bi navê xwe yê kreolî, Ferdinand Joseph La Menthe. Niha jî em ê li Jelly Roll Bluesê ku weke yekem bestekarê cazê tê qebûlkirin, guhdarî bikin.

## STRANA 4'EM

## JELLY ROLL MORTON'S RED HOT PEPPERS – JELLY ROLL BLUES [2:57]

Ji bo New Orleansê heke em bandora Kreol-Frensî mezin bikin şaş çênabe. Merev nikare jiyana cazê ya bajêr bêyî wan bifikire. Gelek tiştên ku atmosfera efsûnî dane bajêr ji Frensayê hatine. Weke mînak, karnavala Mardî Grasê ya ku nîşaneya azweriya jiyanê ya ku New Orleansê daye ber xwe. Di esasê xwe de festîvala ku di sedsala 17'an de ji Frensayê hat, şahiyeke olî ya Katolîk e. Ji bo New Orleansê ji mîrateya frensî û katolîk wêdetir e. Karnawala ku beşdarvan maske û kostuman li xwe dikin, her sal di navbera 2'yê sibatê û 9'ê adarê de li rojeke sêşemê rast tê. Bi heman şeklî funerals jî kevneşopiyeke frensî ye. Funerals mersîmeke şînê ye ku muzîkjen heta goristanê bi muzîkên xemgîn dimeşin û paşê bi awayeke şên vedigerin. Merasimên bi vî awayî hîna jî li başûrê Frensayê li cihên gundewar tên kirin. Lê belê beşa duyem ku me got, vegera ji goristanê taybetiyeke New Orleansê ye. Di vê beşê de sîwanên tavê tên vekirin û bi destmalkan dans tê kirin.

Faktora sêyem ya ku girîngbûna wê zêdetir dike ev bû ku reşik li bajêr dewamî di nav hunera ewropayî de bûn û li cihên muzîkal ên xwedî muzîkên sivik û zindî bûn. Faktora çarem û ya dawî jî ev bû, li Storyvilleyê ji her çînê û kategoriyê mirov hebûn û gelek "tîcaretxane" hebûn û semteke şahiyê bû. Ev pêkhateyên curbecur, bêyî pêşbîniyê û ji cudahiyên hiyararşîk bêrî bi hev re bûn yek.

Divê em ji Storyvilleya ku di belavbûna cazê de xwedan cihekî taybet e, kevanekekê vekin. Storyville, navê kolanekê bû ku ji hêla meclîsa New Orleansê ve ji bo fuhûşê kontrol bike hatibû avakirin. Di heman demê de bi navê Red Light Districta ku li Hollandayê ye weke hev bû. Weke cihên dinê yên bajêr, Storyville jî ji bo muzîkjenan bûbû cihê pereqezençkirinê. Xwediyên kerxane û salonan di serî de deriyên xwe ji afroamerîkiyên ku muzîkên xwe bi xwe re anîbûn vekirin. Her ku dem derbas bû û muzîkjenên spî hatin Storyviilleyê, bêhtir bandor ji muzîkjenê reşik girtin. Jihevveqetîn hêdî hêdî kêm bû û eleqe hat ser tiştên hevpar. Ev hişmendiya neresmî nijadan anîn hinda hev. Helbet di vira de bandora temaşevanan mezin bû, derfeta ceribîna cureyên nû didan muzîkjenan û zêde rexne nedikirin. Buddy Bolden û Jelly Roll ji nav navên herî girîng bûn ku ji nav Storyvilleyê derketibûn. Û helbet divê em bibêjin ku Louis Armstrog li vira mezin bû û diya wî jî yek ji wan jinan bû ku li vira dixebitîn.

Me berê jî gotibû ku nêzî sih heb orkestrayên New Orleansê hene. Van komana li New Orleansê bi seyareyan an jî bi meşê ji kolanê derbas dibûn. Di vê kêliyê de heke du kom beşdar bibûna, contest anjî battle, ango pêşbazî dihat kirin. Bi piranî komên reş û spiyan bi hev re diketin pêşbaziyan. Paşê, contest weke pêşbaziya du piyanoyan an jî li eywanên mezin di navbera big bandan de pêk dihatin. Heta ku Buddy Bolden li bajêr bû vê tacê bi koma xwe re parve dikir. Piştî ku Bolden çû, heke li ser koma spiyan Papa Jack Laine hebûna bi piranî komên dinê wenda dikirin. Orkestrayên spî yên serkeftî bi saya Papa Jack Laineyî derketin holê. Dixieland Jazz Band û New Orleans Rhytmên ku qet cih nedidan soloyê, bi xebatên xwe yên jixweberî yên kollektîf gelek stranên serdemê yên serkeftî navdar kirin. Niha jî heke hûn bên erê, em ê li yekem strana ku bi awayeke tîcarî yekem car weke tomara cazê derketiye piyasê, li Original Dixieland One Stepê guhdarî bikin.

## STRANA 5'EM
## ORIGINAL DIXIELAND - ONE STEP [2:36]

Ji bo ku merev karibe tarza spiyan ya lêdana cazê ya vê dema nêzîk, ji caza New Orleansê ya esil veqetîne; divê merev wê weke caza Dixielandê bi nav bike. Lê ferqeke hew qasî mezin tune ye. Bi taybetî jî piştî ku reşikan dest pê kir di komên spiyan de lêdan, an jî spiyan di komên reşikan de lêdan; êdî ne pêkan bû ku merev bibêje ev caza Dixielandê ye an jî caza New Orleansê ye. Di derheqê cihê ku bêjeya Dixielandê jê derketiye de gelek spekulasyon û efsane hene. Li gorî gotinekê ev peyv ji banknotên 10 dolarî derketiye. Li ser banknotî bi îngilîzî –ten- û li kêleka wê bi frensî –dix- yanî deh divîse. Ev rewş hew qas bandorê li Yankeeyên Bakurî dike ku welêt weke Dixieland bi nav dikin; paşê jî ji bo muzîkê jî gotine Dixielan Jazz. Li gorî daxuyaniyeke dinê jî, bêjeya Dixielandê ji Dixonê ku tevî hevalê xwe Masonî pîvana erdan dikir hatiye. Mason û Dixon berî vê dîrokê, çixêza Mason-Dixona ku eyaletên Başûr û Bakur ji hev vediqetîne diyar kiribû.

Dema ku me got yekem qeyda tîcarî Original Dixieland One Stepa ku li New Yorkê hatiye tomarkirin e, beriya wê – di dema Ragtimeyan de – me behsa silîndirên piyanoyên mekanîk kiribû. Heman ku ne neyteke wê ya tîcarî tune bû jî, ji cihaza tomarkirinê wêdetir, destûr dida ku strana hatiye bestekirin bi mekanîzmayekê tenê bê lêdan. Dîroka tomarkirina dengî ku yekem car di 1877'an de ji hêla Edison ve bi fonografekê hatiye kirin, heta roja me gelek peresan derbas kiriye. Tê gotin ku Buddy Boldenê ku li gorî zanînê tu tomarkirinên wî tune ne, tomareke silîndirî ya fonografê kiriye. Di 1887'an de halê nûjen yê fonografê, ji hêla Alexander GrahamBellî ve weke gramafon hatiye peydakirin, vê yekê jî rê li ber tomarkirinên tîcarî vekiriye. Piştî Şerê Cihanê yê 1'em belavbûna radyoyê, belavkirin jukeboxên di çanda muzîka Amerîkayê de cihekî girîng digirin li kafe, bar û restorantan, di salên 50'yî de derketina TV'yan, piştî wê tomarên band û kasetan û tomarên dîjîtal yên îroyêin, kirine ku muzîk zûtir li nav girseyan belav bibin.

Dema ku em tên salên 20'î, di mijara cazê de sê xalên girîng hene: Serdema geş ya muzîka New Orleansê li Chicagoyê, bluesa klasîk û stîla Chicagoyê. Pêşketina muzîka New Orleansê ya li Chicagoyê bi piranî bi vê yekê tê girêdan ku DYA ketiye Şerê Yekem yê Cihanê. Wê demê New Orleans lîmana şerî bû. Fermandarê hêzên deryayî yê New Orleansê, ji ber ku şahiyên Storyvilleyê " ji bo disîplîna yekeyên xwe bi xetere didît", Storyvilleyê bi biryarnameyê da girtin. Ji ber vê biryarnameyê ne tenê jinên Storyvilleyê, gelek muzîkjen û bi taybetî jî hema hema hemû piyanîstên wê ji karên xwe bûn. Lê belê ne tenê muzîkjenê Storyvilleyê, gelek muzîkjenên dinê jî di nava pirsgrêkên aborî de bûn.

Gelekan ji wan bajêr terikandin. Chicagoyê berê jî gelek muzîkjenên New Orleansî cezb kiribû. Bi vî awayî gelek muzîkjenên New Orleansî koçî Chicagoyê kir û di heman demê de ev koç perçeyeke koça reşikan bû ku ji Başûr ber bi Bakur ve kirin. Tevî ku stîla yekem a cazê navê New Orleansê girtibû jî, vê stîlê dema xwe ya zêrîn bi saya vê koçê di salên 20'î yên Chicagoyê de jiya. Plakên bi nav û deng ên caza New Orleansê, ne li bajarê ku lê çêbûbû, li vira bi gramafonê hatin tomarkirin. Ev gramafon piştî Şerê Cihanê yê Yekem her ku diçû populer dibû. Salên 20'î ji bo bluesê jî demên geş bûn. Helbet blues berî ku caz derkeve, ji nava serdama berî ve hebû. Hîn wê çaxê li cihên gundewarî yên eyaletên Başûr blues dihat gotin. Gelek stranbêjên bluesê weke dengbêjan, di dest wan de banço yan jî gîtarek û hûrik mûrikên wan di tûrikên wan de gund bi gund, zevî bi zevî digeriyan û stranên hêsan yên bleus-folk digotin. Van stranana weke bluesa coutry an jî ya "arkaik" tên pênasekirin.

Di demên ku komên pêşîn yên cazê li New Orleansê dest bi muzîkê kirin, di navbera tiştа ku weke caz dihat pênasekirin û bluesê de cudahiyek hebû. Lê belê di demeke kurt de country bluesa ku weke kilam dihate gotin, tevî nav riha sereke ya muzîka cazê bû. Îro jî muzîsyenên cazê yên herî modern û yên ku herî serbest lê didin jî xwe weke ku bi bluesê ve girêdayî bin hîs dikin. Stranbêja herî mezin ê salên 20'î ku em wan weke dewra bluesa klasîk bi nav dikin, Bessie Smith bû. Tam sed û şêst heb plak dagirtine. Bi qasî deh milyonan hatine firotin û şirketa Columbia ji topavêtinê xelas kiriye.

Di salên 20'î de li derdora amûrjenên mezin ên cazê û stranbêjên navdar ên bluesê yên New Orleansî, li başûrê Chicagoyê, bi navê xwe yê dinê Bronzvilleyê jiyaneke cazê çêbû. Di nava xwe de, weke ya ku 10-20 sal berê li New Orleansê bû jiyaneke zindî bû. Bi awayeke xwezayî ew şênbûna dema New Orleansa kevin kêm bû; ji dêvla wê xirecira bajarê mezin Chicagoyê û nijadperestiya ku zêdebûna wê dihat hîskirin diket nava muzîkê. Bi bandora jiyana cazê ya li Bronzvilleyê stîla bi navê stîla Chicagoyê bi pêş diket. Ciwanên spî yên lîseyî, xwendekarên zanîngehan, ên amator û muzîkjen hew qasî di bin bandora nûnerên caza New Orleansê yê li Chicagoyê man ku êdî hewl didan ku wan teqlîd bikin. Teqlîd bi ser neket lê di vê navberê de tiştekî nuh çêbû. Stîla Chicagoyê. Saksafona ku amûreke weke stûnekî esasî yê muzîka cazê ye, qiymet girt.

Salên 20'î di heman demê de bû şahidê avabûna sektoreke nû ya kêfê, sedema vê avabûnê qedexeyeke ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bêyî ku bixwaze danîbû. Ev dewra ku weke Speakeasy tê bibîranîn, piştî qedexeya çêkirin, îtxalat, barkirin û firotina alkolê ya di navbera 1920 û 1933'yan derket holê. Ev dewra ku gelek mafya tê de afirîn, û piraniya wan di jêrzemînan de gelek clûbên şevê avabûn û ji nijadên reş û spî gelek kes dihatin ba hev; ji bo gelek muzîkjenên cazê bû deriyê pereqezenckirinê. Li gorî lêkolîneкê bi tenê li New Yorkê nêzî 100.000 dezgehên bi vî şiklî hebûne. Di vê dewrê de tê zanîn ku, gangsterê navdar Al Capone bi awayeke deryasayî meşrûb çêkiriye û bi saya wê bûye xwediyê serweteke pir. Piştî straneke aîdî vê serdemê ye, em ê bernameya xwe biqedînin.

**STRANA 6'EM**

## BIX BEIDERBECKE - I'M COMING VIRGINIA [3:19]

Di vê bernameya xwe de me xwest em behsa wê bikin ku bê ka heta dema swingê çanda kêf û şahîyê çawa hatiye guhertin û bandora bûyerên dîrokî li ser cazê çi ye, tevî ku em behsa jiyana gelek muzîkjenên navdar bikin, heta ku ji me hat, me bi we re parve kir. Em hêvîdar in ku we demeke xweş bi me re derbas kir. Mişt hêvî û bextewarî bin.